


ROJANÛ

kovara huneri çandi û edebi



NAVEROK

Nameyên Xwendevanan.....	3
Lı Iraqê Rojnamegeriya Kurdi - Werger : Casım	
Rênas.....	4
Gaziya Konferansa Moskovayê.....	8
Beyannama Konferansa Moskovayê.....	9
Albûma Kurdistanê.....	11
Jı bo piştgriy şeveke çanda Kurdi.....	14
Jiyana mihaciriyê û tesira wê lı ser çanda me -	
Mûnzûr Çem.....	16
Lhevanin - Berevkar : B. Zınar.....	20
Nıfir - Berevkar : Ahmed Koçer.....	22
Peyvên dûhev - Vazgal.....	23
Helbest- Keremê Anqosi.....	26
Berevoka terman.....	27
Quncikê Zarokan.....	28
Weşanên Nû.....	30

Bergê pêşin: Gundeki Kurdistanê (Jı pirtûka "Kurdistan"), N. Kasraian

Sal: 12

Hejmar: 72, Çiriya Pêşin 1990

ISSN 0283-5355

XWEDI: KOMKAR-Swêd

BERPIRSIYAR: Şêroyê BOTAN

NAVNIŞAN: Gustavslundsv.168,1 tr
161 36 STOCKHOLM

TELEFON : 08/26 23 75

HESAP NO: PG. 458980 - 0

UTGIVARE: Svensk Kurdiska

Arbetsföreningen

ANSVARIG UTGIVARE: Ş. BOTAN

ADRESS: Gustavslundv. 168, 1 tr.

161 36 STOCKHOLM

FAX: 08/25 38 57 **PG:** 458980 - 0

LI IRAQÊ ROJNAMEGERIYA KURDÎ /1

HEME SALIH FERHAD

Li Iraqê kê m be ji, ji aliyê lêkolîn û pêşveçûyîna ziman û edebiyata Kurdan xebat hatiye kirin. Heke em dagirkerên Kurdistanê bigrin ber çavan ev yek eşkere tê xuyan.

Bêşik ji aliyê şovetizmê va rejimên Iraqê ji yên Turk û Farisan kêmtir ninin, ji hin aliyên va em dikarin bêjin ku ji wana hovtir û êrişkartin in. Hukumetên Iraqê ji bo helandina çanda ma cehd kirine û tro ji didominin. Heke tro di Kurdistanê Iraqê da radyo, televizyon, kovar û rojname hebûn, di dibistanan da bi zimanê Kurdî bîn dayîn ji ev nayê wê manê ku ewana dostê gelê Kurd in. Beri her tiştî xebat û fidakariyên ronakbîrên Kurdan in. Car carna hatibe bûn an têk çûbe ji, şerê çekdari ye. Em dikarin bêjin ku ev berhemên han bayekî nerm, hênîk û hişyarker e ku di bajaran da eşkere dibê. Bingeha wê, ba û bahozên li ser çiyayên Kurdistanê ne.

Ji van lêkolinan yek jê ji, ji aliyê Heme Salih Ferhad va hatiye kirin. Di sala 1988'an da bi navê "Çend Layenekî Rojname-nûsî Kurdî" ye. Nivîskar di derheqê gelek rojname û kovaran da agahdari dide. Û her weha nivîskar wek lêkolînavanekî rasteqîn rê û olaxan bi kar tîne. Wek nimûne çî daye rojname û kovarên dema ku Partiya Demokrat a Kurdistanê Iraqê û Partiya Komunistê Iraqê eşkere kar dikirin. Lê belê piştî qedexekirina van partiyan, behsa rojname û kovarên ku wan der-xistinê nekiriye. Mesela iro "Rêbazi Nû", "Rizgarî", "Serxwebûn", "Rêgayê Azadî", "Sosyalist", "Pêşeng", "Yekitiya Nivîskarên Kurdistan", "Nûserî Kurdistan", "Gizinga Biçûkan" û derheqê yên din da tu agahdari nedaye.

Wisa diyar dike ku nivîskar di nav çarçevê da maye. Ev çarçeve yan ji aliyê hukma Baas an ji aliyê wî bi xwe hatiye

danin. Digel ewqas kêmasiyan jî, di sa di derheqê weşanên Kurdistanê Iraqê da derketin û weşandina vê lêkolînê tiştê baş e. Xasîna bo Kurdên Kurdistanê Turkiyê dijîn, ku li vir bi zagona bingehîn huviyeta me tê tîkar kirin, ziman û çanda me di bin zordestiyeke mezûn da ye.

Mî ev lêkolîn, ji tipên Erebi wergerand û adabteyî Kurmanjî ya jorê kir, bona xwendevanên RN.

Casim Rênas

ROJNAME Û KOVARÊN KU JI ALIYÊ PARTÎ, KOM- MELE Û KESAN HATINE WEŞANDIN

BANGA KURDISTAN: Kovarek îlmi, edebî û civakî ye û heftê carekî derketiye. Organa hukumeta Şêx Mehmûd e. Hejmara yekemîn di meha Tebaxê sala 1922'an da li Sulêmaniyê çap bûye. Tarîxa hejmara 14'an û yê dawiyê 27'ê meha Çiriya Pêşîn sala 1922 ye. Xwedî û berpirsiyarê kovarê Hecî Mîstefa Yamolki Paşa ye. Zimanê kovarê Kurdî, Tirkî û Farisî ye. Berpirsiyarê nivîsarên Kurdî û Farisî Eli Kemal û M. Nûrî, yê Tirkî jî Refîq Hîlmî bûye.

Paşê di sala 1926'an da Hecî Mîstefa Yamolki Paşa hejmarên 15-17 li Bexdayê çap kirîye. Cemal Xeznedar hejmarên hemû kovara "Banga Kurdistan" berhev kirîye û di sala 1974'an da ji nû va çap kirîye.

LI IRAQÊ ROJNAMEGERIYA KURDÎ / 1

HEME SALIH FERHAD

Li Iraqê kêr be ji, ji aliyê lêkolîn û pêşveçûyina ziman û edebiyata Kurdan xebat hatiye kirin. Heke em dagirkerên Kurdistanê bigrin ber çavan ev yek eşkere tê xuyan.

Bêşik ji aliyê şovenizmê va rejimên Iraqê ji yên Tirk û Farisan kêmtir nînin, ji hin aliyên va em dikarin bêjin ku ji wana hovtir û êrîşkartin in. Hukumetên Iraqê ji bo helandina çanda ma cehd kirine û tro ji didominin. Heke tro di Kurdistanê Iraqê da radyo, televizyon, kovar û rojname hebûn ji, di dibistanan da bi zimanê Kurdî bîn dayin ji ev nayê wê manê ku ewana dostê gelê Kurd in. Beri her tiştî xebat û fi-dakariyên ronakbîrên Kurdan in. Car carna hatibe birin an têk çûbe ji, şerê çekdari ye. Em dikarin bêjin ku ev berhemên han bayekî nerm, hênûk û hişyarker e ku di bajaran da eşkere dibe. Bingeha wê, ba û bahozên li ser çiyayên Kurdistanê ne.

Ji van lêkolînan yek jê ji, ji aliyê Heme Salih Ferhad va hatiye kirin. Di sala 1988'an da bi navê "Çend Layenekî Rojname-nûsi Kurdî" ye. Nivîskar di derheqê gelek rojname û kovaran da agahdarî dide. Û her weha nivîskar wek lêkolînanekî rasteqîn rê û olaxan bi kar tîne. Wek numûne çî daye rojname û kovarên dema ku Partiya Demokrat a Kurdistanê Iraqê û Partiya Komunistê Iraqê eşkere kar dikirin. Lê belê piştî qedexekirina van partiyan, behsa rojname û kovarên ku wan der-xistine nekiriye. Mesela tro "Rê-bazî Nû", "Rîzgari", "Serxwebûn", "Rêgayê Azadî", "Sosyalîst", "Pêşeng", "Yekitiya Nivîskarên Kurdistan", "Nûserî Kurdistan", "Gızînga Bîçûkan" û derheqê yên din da tu agahdarî nedaye.

Wisa diyar dike ku nivîskar di nav çarçevê da maye. Ev çarçeve yan ji aliyê hukma Baas an ji aliyê wî bi xwe hatiye

danin. Digel ewqas kêmasiyan ji, disa di derheqê weşanên Kurdistanê Iraqê da derketin û weşandina wê lêkolînê tiştê baş e. Xasîna bo Kurdên Kurdistanê Tirkîyê di-jin, ku li vî zagona bingehîn huviyeta me tê inkar kirin, ziman û çanda me di bin zordestiyê mezin da ye.

Mîna ev lêkolîn, ji tipên Erebi wergerand û adabteyî Kurmancî ya jorê kir, bona xwendevanên RN.

Casim Rênas

ROJNAME Û KOVARÊN KU JI ALIYÊ PARTÎ, KO- MELE Û KESAN HATINE WEŞANDIN

BANGA KURDISTAN: Kovarek îlmî, edebî û civakî ye û heftê carekî derketiye. Organa hukumeta Şêx Mehmûd e. Hejmara yekemîn di meha Tebaxê sala 1922'an da li Sulêmaniyê çap bûye. Tarîxa hejmara 14'an û yê dawiyê 27'ê meha Çiriya Pêşîn sala 1922 ye. Xwedî û berpirsiyarê kovarê Hecî Mîstefa Yamolki Paşa ye. Zimanê kovarê Kurdî, Tirkî û Farisî ye. Berpirsiyarê nivîsarên Kurdî û Farisî Eli Kemal û M. Nûrî, yê Tirkî ji Refîq Hîlmî bûye.

Paşê di sala 1926'an da Hecî Mîstefa Yamolki Paşa hejmarên 15-17 li Bexdayê çap kirîye. Cemal Xeznedar hejmarên hemû kovara "Banga Kurdistan" berhev kirîye û di sala 1974'an da ji nû va çap kirîye.

ROJÎ KURDISTAN : Rojnameya siyasi, cıvaki û edebi ye, heftê carek der çûye. Berpırsiyar M. Nûri, serniviskar ji Eli kemal bûye. Hejmara yekemin 15'ê meha Çıriya Paşın sala 1922'an, hejmara dawî yê 15'an ji dî 3'yê meha Adara sala 1923'an da lî bajarê Sulêmaniyê hatiye çap kırın. Ev rojname ji, jî aliyê Cemal Xeznedar va dî sala 1973'an da bî teknika ofset jî nû va hatiye çap kırın.

BANGA HEQ: Rojnameya siyasi ya hefteyi ye. Organa hukumeta Şêx Mehmûd a fermi ye. Hejmara yekemin dî 8'ê meha Adara sala 1923'an da lî Şıkevten Çasenê lî bajarokê Surdaşê ku girêdayî Sulêmaniyê ye hatiye weşandin. Hejmara sısêyan (3) ku ya dawiyê ye, dî sala 1923'yê meha Avrêlê da çap bûye. Pıştî ku Şêx Mehmûd mecbûr dimine û jî mıntıqê dertê, hemû makinên çap û tıştên dın dıkeve destê İngilızan.

UMÛDÊ İSTİKLAL: Rojnameya abori, cıvaki û edebi ye û lî Sulêmaniyê hatiye weşandin. Serniviskariyê bî rêz Ahmed Sebri, Refiq Hilmî, Ahmed Hıvaçe û Huseyn Nazım kırine. Ev rojname ji organa hukumeta Şêx Mehmûd bûye. Hejmara yekemin dî 20'ê meha İlonê ya sala 1923'an da derketiye. Bî tevayî 25 hejmar derketiye.

HİVA: Kovara ilmi û edebi ya mehane ye. Xwediyê wê Cemil Baban e, serniviskarê ewılı (sereke) Hafız Mıstefa Qazi, paşê Haşım Doxramacı bûne. Dî 9'ê meha Gulana sala 1958'an da hejmara yekemin lî Bexdayê çap bûye. Heta sala 1963'an 36 hejmar derketiye û dî eyni salê da hatiye girtın.

ŞEFAQ-BEYAN: Kovara ilmi, cıvaki û edebi ye, 15 rojan carek hatiye weşandin. Xwediyê wê Evdılqadır Berzenceyi bûye û bî zımanê Kurdi û Erebi çap bûye. Hejmara pêşın dî 15'ê meha Çıleya Paşın a sala 1958'an da lî bajarê Kerkûkê derçûye. Dî sala

1959'an da navê xwe guhurandiye û bûye Beyan. Dî sala 1961'an da jî weşana vê kovarê lî Sulêmaniyê hatiye domandin. (Çend hejmar derketiye, niviskar nedaye kış kırın.)

PÊŞKEVTIN: Ev kovar bî zımanê kurdi û Erebi hatiye weşandin û 15 rojan carek derketiye. Xwediyê kovarê Mihemed Bırıfkani, serniviskar ji Abûqat Yunus Sabbah bûye. Hejmara yekemin dî 28'ê meha Sıbata sala 1958'an da hatiye çap kırın. Heta sala 1963'an, ango demeki dūr û dirêj, hatiye weşandin û dî eyni salê da hatiye girtın. (çend hejmar derketiye, niviskar nedaye xuyan.)

KEBAT: Rojnameya siyasi ya rojane ye. Erebi û kurdi hatiye weşandin. Organa Partiya Demokrat a Kurdistana Iraqê ye. Hejmara pêşın 4'ê meha Avrêla (Nisan) sala 1959'an da derketiye. Heta 28'ê meha Çıriya pêşın a sala 1961'an 426 hejmar derketiye û hatiye girtın.

BIRAYETİ: Rojnameya siyasi ya rojane ye. Organa PDK-I ye. Jî bo weşandinê dî sala 1959'an 11 meha yeki (Çıleya Paşın) da izin wergirtiye. Lê dî derheqa vê rojnamê da dî çavkaniyên kurdan da agahdari tune. Lî gor çavkaniyên Ereban, pıştî iznê ev rojname lî dîji zagona derketiye û hatiye qedexekırın. Wısa diyar e ku rojname qet derneketiye û dî cih da hatiye qedexekırınê.

Lî gor daxwaziya iznê (destûrê), xwediyê rojnamê Xusro Tewfiq e. Rojname wê bî zımanê kurdi û Erebi bîhata weşandin. Ev rojname dî sala 1959'an da dî meha Tirmehê da ha-

tiye qedexekırın.

RASTİ: Rojnameya siyasi ya hefteyi ye. Xwediyê rojnamê Enwer May e. Berpırsiyar Abdoleh e. Hejmara pêşın dî sala 1959'an da lî bajarê Mûsilê çap bûye. (Çend hejmar derketiye, niviskar nedaye xuyan.)

AZADÎ: Organa Partiya Komunist a Iraqê ya seksiyona rêxistina Kurdistanê ye. Rojnameyeke siyasi ya rojane bûye. Xwedi û berpîrsiyar, Abûqat Naif Yunus e. Hejmara pêşin di Adara 1959'an da li kerkûkê, paşê ji meha Tebaxê pê va li Bexdayê weşana xwe domandiye. 59 hejmar derçûye û di 28'ê meha Çiriya Pêşin a sala 1960'an da hatiye girtin.

RAYA GEL: Rojnameyeke siyasi ya hefteyi ye. Bi zimanê kurdi û Erebi derçûye. Xwedi wê Sıddîq Bilkûni, berpîrsiyar ji Sıddîq Ebdullah bûye û li Kerkûkê derketiye. Di sala 1959'an, 6'ê meha Îlonê da dest bi weşanê kiriye û heta sala 1963'an weşana xwe domandiye. (Çend hejmar derketiye, nivîskar di pirtûka xwe da nedaye xuyan.)

RIZGARÎ: Kovara diroki, cıvaki û edebi bûye û heftê carek li Bexdayê hatiye weşandin. Xwediyê kovarê Salih Heyderi, sernivîskar ji Abûqat Fûad Celal bûye. Hejmara ewil di meha Avrêla sala 1959'an da çap bûye û heta sala 1960 3'yê meha Avrêlê jiyana xwe domandiye û di vê tarixê da hatiye girtin.

NEWROZ - MEŞXELEYÊ NEWROZ : Kovara edebi, cıvaki û ilmi ye. Xwediyê kovarê Abûqat Kemal Mirza Kerim e û li Sulêmaniyê çap bûye. Hejmara pêşin di sala 1959 meha Avrêlê derketiye. Ew sal sê hejmar derketiye. Paşê navê wê kirine Meşxeleyê Newroz û wek rojname heta sala 1960 weşana xwe domandiye.

AFRET (JIN) : Kovara mehane ya jinan e. Bi zimanê Kurdi û Erebi hatiye çap kirin. Ji aliyê Yekitiya Jinên Iraqê li Bexdayê hatiye weşandin. Di sala 1960'an da derçûye û 15 hejmar derketiye. Piştî 15 hejmarî derneketiye.

BIRWA: Kovareke hefteyi ya siyasi, cıvaki û edebi bûye. Xwedi û berpîrsiyarê kovarê Kemal Mirza Kerim

e û li bajarê Sulêmaniyê hatiye weşandin. Di duduyê Tirmeha 1960 da hejmara pêşin derçûye û heta hejmara 95'an derketiye. Di sala 1963'an meha Çileyê Paşin da hatiye girtin.

DENGÊ KURD: Rojnameyeke hefteyi ya siyasi bûye. Bi zimanê Kurdi û Erebi li Bexdayê hatiye weşandin. Berpîrsiyar û xwediyê rojnamê Abûqat Omer celal Heweyzi bûye. Hejmara ewlin di meha Sıbata sala 1960 da derketiye û hetani meha Gulana sala 1961'an hatiye weşandin.

ROJÎ KURD: Kovareke cıvaki, siyasi û edebi bûye. Xwediyê wê Abûqat Cemal Şali ye û li bajarê Sulêmaniyê çap bûye. Hejmara pêşin di sala 1960 da, ya dawiyê ji di sala 1961 meha Îlonê da hatiye weşandin.

ÇARESERKIRDINÎ KIŞT Ê KAL : Kovara Wezaretê Qırş û Qal bûye. Heftê carek bi zimanê Kurdi û Erebi derketiye. Hejmara pêşin a zimanê kurdi di meha Tirmeha sala 1960 da hatiye weşandin. Mesûlê vê beşê Mehemed Mella Kerim bûye. Hejmara 12'an û ya dawiyê di Çiriya Paşin a sala 1962'an da ye.

IRAQA NÛ: Ji aliyê Wezaretê Postê, heftê carek û bi wêne hatiye weşandin. Di sala 1960 meha Çiriya Pêşin da hejmara ewlin çap bûye. Berpîrsiyarê beşa Kurdi Mehemed Mella Kerim û Farûq Mîstefa Resûl bûne. 24 hejmar derketiye.

EDÎBÊ IRAQÊ: Parçê kovara Erebi ya bi navê El Edîb El Iraq bûye. Kovareke çandi û edebi ne. Ji aliyê Yekitiya Edebiyatvanên Iraqê hatiye weşandin. Di nav redaksiyonê da Pakize, Refîq Hîlmi, Abdulrezaq Mehemed, Mehemed Tewfîq Wûrdî cih girtine. Hejmara pêşin, di eyni wextê da ya paşin, di meha Tirmeha sala 1961 da hatiye weşandin.

KURDISTAN: Rojname rojane ye û li Bexdayê di 4'ê meha Adara sala

mar derketiye û dî l'ê Avrêla sala 1961 da êdî nehatiye derxistin.

RONAHÎ: Kovara edebî, cıvaki û îlmî ye û lî Bexdayê çap bûye. Mesûl û xwediyê kovarê, Hafız Osman Qazî bûye. Dî navbeyna sala 1960 meha Çiriya Pêşîn heta Çiriya Paşîn a sala 1963'an weşana xwe domandiye. Dî sala 1963'an da hatiye qedexekirin.

HEWLÊR: Rojnameya hefteyi, bî zımanê Kurdi û Erebi jî alî belediya bajarê Hewlêrê hatiye weşandin. Dî navbeyna sala 1962 - 1963'an da hatiye weşandin.

JÎN: Rojnameya edebî ye. Xwediyê rojnamê Kake Fellah, berpîrsiyar jî Abdulqadir Berzenci ye. Hejmara pêşîn dî sala 1970 da lî Sulêmaniyê çap bûye.

HEWLÊR: Rojnameya mehane, bî zımanê Kurdi û Erebi, jî aliyê belediya Hewlêrê va hatiye weşandin. Mesûlê wê Seid Mehemed Dîzeyî, sernivîskar jî Mehemed Mewlûd bûye. Dî sala 1970 meha Gulanê da hejmara pêşîn, dî sala sîsêyan (1972) meha Heziranê da jî hejmara dawîn çap bûye.

BIRAYETÎ (BIRATÎ): Organa PDK-I ye. Xwedî, Hebib Mehemed Kerim e. Mesûlê beşa Kurdi Seid Nokan, Refîq Çalak û Remzî Qezzaz bûne. Ewîlî lî Bexda paşê lî Sulêmaniyê hatiye çap kirin. Hejmara pêşîn dî l'ê meha Heziranê sala 1970 da çap bûye û ew sal 13 hejmar derketiye. Hejmara dawîn dî meha Avrêla sala 1971 da hatiye weşandin.

ŞOREŞA QIRŞ Ê QAL: Jî aliyê Wezaretê Qirş û Qal a beşa propagandayê, bî zımanê Kurdi û Erebi hatiye weşandin. Hejmara kovarê ya ewlî dî sala 1970 meha Tirmehê da hatiye weşandin û ser hev 5 hejmar derketiye.

ZANYARÎ (ZANÎN): Kovara îlmî ya kurdan ev tenê ye. Xwediyên kovarê Dr. Ezîz Emin û Telet Naqîr in. Berpîrsiyar jî Dr. Şamal Mecîd Fereç bûye. Hejmara ewlî dî meha Çiriya

Pêşîn a sala 1970'an da, ya dawîn û ya şeşan dî sala 1973 meha Çiriya Pêşîn da lî Bexdayê hatiye weşandin.

ÇÎYA: Lî Dihokê derçûye. Kovareke edebiyatê bûye û sernivîskar Bedîrxan Sîndî bûye. Dî meha Çiriya Paşîn a sala 1970 da hajmara pêşîn çap bûye. Hejmara duduyan jî dî yekê meha Sîbata sala 1971'an da hatiye weşandin.

GETÎ PÛL (PÛLÊN CÎHANÊ): Kovara sînet, edebiyat û îlmî bûye. Jî aliyê pûlhezan bî Erebi û Kurdi derçûye û lî Bexdayê çend hejmar derketiye. Berpîrsiyarê beşa Kurdi Cewdet Xeznedar bûye û hejmara pêşîn dî sala 1970 meha Çileyê Pêşîn da hatiye weşandin.

NÛSERÎ KURD (NIVÎSKARÊ KURD): Jî aliyê Yekitiya Nivîskarên Kurd lî Bexdayê hatiye weşandin. Sernivîskar Merûf Xeznedar, sekreterê weşanê Dr. Nesrîn Fexrî bûye. Hejmara pêşîn dî meha Adara 1971, ya axîrî û ya 11'an jî dî sala 1974'an da hatiye weşandin.

DENGÊ COTYAR: Rojname hefteyi bûye, jî aliyê Yekitiya Gundiyên Iraqê bî zımanê Kurdi û Erebi hatiye weşandin. Hejmara pêşîn dî sala 1971 meha Gulanê da hatiye weşandin. Jî hejmara 120'an vîrdê bî navê Cotyar tenê bî zımanê Kurdi hatiye çap kirin.

PAŞKOYÊ BIRAYETÎ (PARÇÊ BIRATÎYÊ): Ev kovar wek rojnaman heftê carek derketiye. Berpîrsiyar Remzî Qezzaz e û lî bajarê Sulêmaniyê derketiye. Hejmara pêşîn dî 23'yê meha Avrêla 1971'an da çap bûye.

BIRAYETÎ: Rojnameke siyasi û hefteyi, lî Sulêmaniyê hatiye weşandin. Xwediyê rojnamê Hebib Mehemed Kerim, sernivîskar Dara Tewfîq, berpîrsiyar jî Remzî Qezzaz bûne. Hejmara pêşîn dî 11 meha Îlona sala 1971'an da, ya dawîn jî dî 18 meha Adara 1972'an da hatine çap kirin.

BANG

**J1 Serokê Yekitiya Sovyetê Heval Mixayil Gorbaçov ra
J1 Meclisa Heri Bîlind a Yekitiya Sovyet ra
J1 Serokatiya Sovyeta YKSS Heri Bîlind ra**

Mixayil Sergivêçê qedîrbîlind, hevalên hêja,

Em beşdarên konferansa zanisti ya bi navê "Kurdên Yekitiya Sovyetê": Dirok û dema me" ku cara yekemîn di rojên 25-26'ê Tirmehê jî aliyê Enstituya Marksizm-Leninizmê, Beşa Pêwendiyê Navnetewî û bi hevkarîya partiyên komunist ên Azerbeycan, Gurcistan, Ermenistan, Qazaxistanê û Enstituya Rojhilatnasyîyê hat amadekirin, ku têda me rapor, gotar û peyvandinên zanyar û pêzanên jî navçên ku Kurd bi komasi lê dijîn wek Azerbeycan, Gurcistan, Ermenistan, Qazaxistan, Kirgîzistanê û parwelatê Krasnodarê, wisa jî yên mewanên Ewropayê û Rojhilata Nêzik bihistin û enane kirin. Bi tevayî ek hatine ser wê baweriyê weki konferanseke weha, tenê di şertên perestroikayê da dikaribû bihata amadekirin, ya ku jî aliyê partiyê va hatiye destpêkirin bona ku normên Leninizmê bi rastiyên wekheviya gelan û wisa jî gelên ku welatê wan ê netewî tunene û berê hatine surgûnkirin û zêrandin, biparêze.

Bi vê yekê ra girêdayî, em jî we hêvî dikin ku hûn pirsên Kurdên Yekitiya Sovyetê, yên ku di dema Stalin da jî cih û warên xwe hatine dûrxistin, çareser bikin.

Beşdarên konferansê li ser wê fikrê ne, ku pêwîst e li ser bîngeha qanûna Yekitiya Sovyetê, li gor azadi û pêşdabirina neteweyên hevvelat, yên ku jî sinorê dewleta xwe ya netewî dijîn û yên ku li Sovyetê welatê wan tunene, bi gihîjin mafên xwe. Ango em pêwîst dibînin ku:

* Otonomiya kurdan a navçeyî (Kurdîstana Sor), ku berê hebû, disan bête sazîrîn û ziyana maddî ku jî hingê va gihîştîye kurdan li ber çavan bête girtin. Jî nûva damezrandina otonomiya netewî, wê jî bo komîrîn û hevîrtîna Kurdên ku di dema Stalin da jî hev hatine dûrxistin û surgûnkirin, bibe alîkarî. Hingê disan bawerîya wan wê bi hukumetê bê. Ev yek her wisa wê dijîyatiyên netewî ku li wan welatan da (komaran) heye, bide hîldan.

* Em bawer dikin ku hukumet û gelên Azerbeycanê, Gurcistanê, Ermenistanê, Qazaxistanê, Kirgîzistanê, Turkmenistanê wê derdê gelê zêrandî rast fam bikin û alîkariyê bîdine çareserkirina pîrsa wan.

* Em hêvî dikin ku nûnerên gelê Kurd, çî di organên idara nawendî da çî jî şên navçeyî da û wisa jî di komîsyona encumana bîlind a Sovyetê da cih bigirin, da ku bi pirsên Kurda va mijûl bin.

* Li hîn komarên Asya Navîn û Pîştîkavkazê, jî bo Kurda rewşeke xeter peyda bûye. Em hêvî dikin ku zordayîn û qewîrandina kurdan bête sekinandin. Û di rewşeke wisa da, jî bo Kurdan cihên starkerîyê bê kîvîrkirin.

L1 ser navê Konferansê:

N. K. NADIROV

I. N. KITAEV

S. X. MGOYAN

M. S. BABAIEV

E. A. BAGRAMOV

A. AVDALI

G. E. TRAPEZNIKOV

KONFERANSA MOSKOVAYÊ

Şikr ji xwedê ra... Wek bi rûsi tê gotin: "Qeşa ji ciyê xwe livya". Dî nav 70 salê diwana Sovyetê li bajarê Moskovayê cara yekemîn di Institutûya marksizm-leninizmê li ser pirsên Kurda konferanseke çê bû.

Wek tê zanin, di sala 1923 da bi fermana Lenin li komara Azerbeycanê otonomiya Kurda pêk hat. Lê mixabin, di sala 1930'i dema Stalin da, serxwebûna Kurda li Sovyetê ji holê ra bû û pîr kes hat sîrgûnkirin û asimile kirin. Roja iro her netew kul û derdê xwe bi dengê bilind diyar dîke û Kurd ji êdi du caran li Moskova mitingên xwe derbaz kirin û dewa mafên xwe yê millî dîkin. Em bawer in, ji iro pê va Merkeza Partiya Sovyetistanê ya Komunist wê rola xwe ya pozîtîv di jiyana Kurdên Sovyetê û Kurdistanê da bileyize.

Dî konferansê da ji Kurdistanê ji hun kesên navdar wek Samî Abdullrehman, Osman Sebri, Ezîz Mihemmed û yê mayîn beşdar bûn.

Li jêrê teksta beyannameya dawîya Konferansê pêşkêşî xwendevanên Roja Nû dikim.

Marina Ezîz.

"KURDÊN SOVYETÊ: DÎROK Û DEMA ME"

Dî rojên 25-26'ê meha Tirmehê da, li bajarê Moskovayê konferanseke Hemsovyetiyê ya zanîstî bi tîma "KURDÊN SOVYETÊ: DÎROK Û DEMA ME" hat çêkirin. Zanyar, kurdnas, cîvaznan, nivîskar û ronakbîrên Kurd ji Sovyetê û ji welatên dereke tevi karê konferansê bûn.

Dî Konferansê da pirsên civaki-siyasî, netewî-çandî yê jiyana Kurdên Sovyetê hatin raçavkirin û vekolandin. Dî hoyên demokrasi û serbestiya nuh da, ji aliyê diroki va rewşa Kurdên Yekitiya Soviyatê hat analîzkirin. Axaftinên beşdarên konferansê li ser aliyên pêşdaçûyînan pozîtîv ên jiyana çandî û netewî ya Kurdên Sovyetê bûn. Xêncî (bîlî) vê yekê, wîsa ji derheqê inkarkirina politika

milletiyê di halê Kurdan da, ku di zemanê Stalinizmê da bûye sedemê rakirina Kurdistanê otonom (Kurdistanê Sor- li Azerbeycanê, di sala 1929'an da.) û bi zorê asimilekirin û sîrgûnkirina Kurdan di salên 30-40'i da; hilanina (girtina) dibistanên Kurdî û çapxanên Kurdî, û bi derew kêr nişandayina hejmara Kurdên Yekitiya Sovyet, bi rapor û gotaran hatin diyarkirin.

Ecêb e, lê di salên "perestroyka" da ji pîrgîrêkên Kurdî nayên çareserkirin, mafên millî yê wîndakîrî nayên bi cih anin. Karê weşandina rojname û pirtûkên Kurdî, weşanên radyo yê Kurdî, dersdayina zîman û edebiyata Kurdî zehmetên giran dikîşînin. Derxistina rojnameke Kurdî û weşanên radyo yê Kurdî li Ermenistanê û Gurcistanê tenê ji bona perçeke gel kardar in. Dî welatê me da kar û barên helkîrîna daxwazên Kurda yê netew-ruhî qet nayên koordinekirin. Ango nawendên çandî yê gelêrî di mîntiqên cuda cuda da, tenê derxistina rojnameke ji bona beşeke millet e. Êdi pîr sal in ku di diwana here bilind da û pîştî bijartînan nû di parlamentoyên komaran da ji milletwekilê Kurd tunene. Herçend roja iro, politîka rastkirina şaşîyan di siyaseta millî da hatiye bangkirin ji, rûmeta mafên êtnosa Kurda yê netewî hin xirabîr û nizîmtîr dibe.

Dî konferansê da bi xemgîni derheqê tunebûna tîkîliyên (pêwendiyên) çandî û mayîn di nav Kurdên Sovyetê û Kurdên welatên dereke, fersenda bîdestxistina rojname, kovar û kitêbên Kurdî ji welatên der hat rawestandî.

Beşdarên konferansê bi yekdengi ditina xwe diyar kirin weki zûva dem hatiye ku wek li welatên dereke çapemeniya Kurdî (pirtûk, rojname û kovarên Kurdî) bi tipên latîni be. Û pêwîst e ev astengên nenatûral di warê nêzikbûna berbî edebiyata Kurdî da ji ortê bêterakirin. Fîkra meraqkirina Kurdên Sovyetê li ser halê Kurdên Kurdistanê yê giran û ne insani di şerê ji bona bîdestxistina mafên xwe yê netewî, demokratîk û çarenûsî da wek fîkra ta-

bii hat ditn. Bı dileki xemgin derheqa bêdengmayina cihanê lı ser Kurda û şerê wan ê azadixwaziyê, ku pêwendiyên Rojhilat-Rojava û karên navnetewi da hina cihê xwe ji hêja negirtiye, peyivin.

Konferansê nerazibûna xwe diyar kir ji bona bêdengmayina Yekitiya Sovyetê lı ser qirkirina Kurda û wêrankirina cihê wan, bı karanina çekê kimyevi dı Kurdîstana Iraqê da (1988).

Em alikari û piştgiriya wan rejimên zordest wek tişteki anormal û ne dı cih da dibinin. Jı ber ku ew bı neheqi û hoviti êrişê dibine ser gelê Kurd, ku ji bo destxistina mafên xwe yên netewi şer dıke.

Em dı wê baweriyê da ne, ku iro dema wê hatıye weki Yekitiya Sovyetê bı giyanê (ruhê) fikirdariya nû, problema gelê Kurd têxe rojeva rêxıstın û saziyên navnetewi û beri gışki Yekitiya Milletan.

Rapor û gotarên ku dı konferansê da hatın pêşkêşkirın, dı warê netewi û huqûqi da rewşa Kurdên Sovyetê anin ber çavan. Konferans rakirina mıntıqa Kurda ya otonomiyê dı sala 1930 da wek inkarkirina mafên Kurda yên netewi ecêb dibine. Ê jı bona vê yekê, heqê xwestuna bı cih anina otonomiya Kurda heye. Peydakirina mekanizma qedirgirtina mafên Kurdên Sovyetê iro eseyi ye û divê niha bête hel kirın. Jı bona karên rêk û pêk dı jiyana çandi-netewi da, divê karê koordinasiyayê çê bıbe, ango jı bona vi kari divê rêxıstıneke nû çêbe wek Asosiasiya Kurdên Yekitiya Sovyetê ya Hemsovyetê ya ku serokatiya xwe ji nûnerên Kurdên hemû mıntıqên welêt pêk bê. Ê jı bona vi kari sazkirina Nawenda Çanda Kurdi lı Moskovayê bı komelên wê yên lı hemû cihên ku Kurd lê dijın, bı maneyeke pir giring e.

Konferans hêvidar e, ku diwana Sovyetê pirsên kar û barê Kurdên jı cihê xwe rakiri (jı bona pevketna pêwendiyên netewi), bı guhdariyeke mezın va û zûtirê lê binihêre. Jı bona vê yekê armanca kurda, peydakirina firsendên nûkirina otonomiya Kurdîstanê ye da ku lı wir cıvandına kurda yan jı komkirina kurdan lı navçeke Sovyetê -bı tebiyeta nerm û neserma- û lı wir çekirina otonomiya wan dirust e û dı cih da ye. Konferans bawer dıke, ku lı her de-

rên ku Kurd lê dijın, bı kontrol û garantiya Merkezê û diwanên komaran, mafên Kurdên Sovyetîstanê yên milli û demokratik dıkarın bèn qedandın.

Konferans giring dibine ku lı Moskovayê-programên radyoyê bı Kurdi bête weşandın û edebiyata Kurdi bı tipên latini bête neşirkırın.

Konferans piştgiriya politika guhartınên demokratik, liberalizekirina jiyana welêt a netewi û cıvaki û siyasi wek mecala xweşi û pêşdaçûyina hemû millet û neteweyan dıke.

Dirola Kurdan, ya ku bı qewımandınên dramatik va tıji ye, me dıghine wê baweriyê ku azadi û xweşiya jiyana gelan lı ser bingehê dijayetiya nava menfaeta gelan, an jı inkarkırın û zordestiya aliyeki pêk nayê. Lê belê bı harmoni qedirgirtın û baweriya herdu aliyan dıbe. Bona vê yekê divê ew xwe jı hemû cureyên nijadperestiyê û ezeziya netewi dır bıgrın.

Dema iro ku welat dı rewşeke aloze û ne hêsa da ye, gelê kurd wê bı dilsoziya xwe ya dirola û qenc, pêwendiyên xwe bı wan gelên ku pêra dıji dıparêze û dı her wari da, jı bo peydakirina mecala pêşdaçûyın û serfiraziya gelên bıçûk û mezın hewl dıde.

Serokê komita konferansê ya sazi, Akademiya Kazaxıstanê ya zanısti

NADIROV N.K

Hevalserokê komitê, dewsgirtiyê direktorê Instituya Marksım-Leninizmê ya Merkeza Kompartiya Sovyetê

KITAEV I.N

Nûnerê komita saziyê: Endam-korr Akademiya Ermenistanê ya zanısti

MGOYAN S.X

Sekreterê bersıvdar, serokê cıvaka "Yekbûn"

BAKAEV M.S


Serwerê para pevgrêdanên netewi ya Instituya Marksizm-Leninizmê, doktorê ilmê felsefê

BAGRAMOV E.A

Sekreterê bersıvdar, rojnamevan kandidatê ilmê problemên neteweyên sırgûnkiri ya para têkiliyên milli ya Instituya Marksım-Leninizmê rex merkeza kompartiya Sovyetê

TRAPEZNIKOV G.E.

"Albuma Kurdistanê"



Îsal bî navê "Kurdistan" pirtûkeke hêja wek album û bî qeliteyeke gelek baş hate weşandin. Orijinala pirtûkê, bî Îngilizi hatiye nivîsin û çapkirin. Elisabet Svensson, bî alikariya nivîskar, şair, zîmanzanê Kurd ev berhema wergerandiye zîmanê Swêdi bî riya çapxana "Oriental Art Publishing" daye weşandin.

Pirtûk ji 127 didemên rengin û nivîsên agahderiyê pêk tê. Wi tarix, tore û şiklên jiyana eşirên kurd ên koçer radixe ber çavan. Fotograf û nivîsên pirtûkê bî teybetî lî ser Kurdên kurdîstana Îranê ne.

Nivîsên pirtûkê ji alî ZIBA ARSHY û KHOSRO ZABIHI va hatine nivîsandin. Ziba Arshy bî xwe sosyolog e û xwendina xwe ya bilind lî Universîteya Tehranê kuta kiriye. Ew her wisa lî Îranê lî ser gelek eşirên koçer lêkolîn kiriye.

Khosro Zabihi lî Universita Berkeley a Kaliforniyayê doktora xwe dide. Bî navê "Mysticism in Kurdistan" (Sîrê kurdîstanê) (1978) berhemeke wi hatiye weşandin.

Fotografên pirtûkê ji alî NASROLAH KASRAIAN va û piştî sala 1966 hatine kişandin. Wi lî Universîteya Tehranê beşa huqûqê qedandiye. N. Kasraian di gel huqûqzaniya xwe, zêdetir bî wênekêşî nav û dengê xwe daye hisandin. Lewra lî gelek welatan fotografên wi hatine raxistin.

Lî jêr em beşekî ji pirtûkê pêşkêşî xwendevanan dikim.

Werger: **DILSOZ**

"KURD WEK ŞAIR TÊN DINÊ"

Rihê Kurdan di literatûra wan a dewlemend, muzik û stranên wan ên gelêri da xwe aşkere dike. Tevî ku di nav Kurdan da nexwendayî gelek belav bûye ji, kultur xeysiyeta xwe ya taybetî parastîye. Literatûra Farisî û Erebi bando-reke mezin lî ser literatûra Kurdi kiriye. Tevî viya ji, di stranên Kurdi yê gelêri da, ku bî navê "Lawîj" an ji "Beyt" tînan bî navkirin, rihê serhildanê hêj ji serdestî dike û ev rihê han tu car serî ji qanûn û nizaman ra danayne. Serhildan xwe di destanên qehremanî yê şer da nişan dide, di stranên wi yê evîni û sitemkari yê xatirxwazî û ji hev qetandinê da nişan dide.

Lî Kurdîstanê bî sedsalan literatûra Kurdi wek muzika gelêri hate rawekirin. (1) Ev, bî rihê wi yê dewlemend va keliyaye, bî hestên tujî yê xweş û mêrxasî va keliyaye ku gel nîkare jê bireve û pê va grêdayî dîmine. Lî ba eşiran bûyerên diroki yê dûr û nêz, ên derheqa jiyân û mirin, evîni û xem di komciyîn û bûyerên mezin da tînan zîman.

Mir Şerefhanê Bedlîsî navekî giring e di literatûra kurdi da, ku nivîskarê berhema tarixî ya bê emsal ŞEREFNAME ye. Ev berhema han belgeyeke rawekirîna jiyana navbera salên 1290-1597 dide xuyan û di eynî wextê da yekemîna pirtûka Diroka kurdi e. Bî vî pirtûkê nivîskar dixwaze bide xuyan ku tevî welat û diroka xwe neteweyekî Kurd heye. Ev belgeya şaheser bî naveroka xwe zanîna Kurdan a neteweyî dide xuyan. Kesê ku cara yekemîna "Şerefname" wergerand Veliaminoff-Zernoff bû (1860) û iro ev pirtûk bî gelek zîmanên din ji hatiye çapkirin.

Di şîrên Kurdi da hozanê mezin û naskirî Ahmedê Xanî ye (1650/51-1706) ku ji bakûra Kurdîstanê, ji Hekkariyê ye. Xanî welatparêzekî mezin bû, bî şîr û xebata xwe ya mamosteyiyê jiyana xwe di riya gelê Kurd da mehand.

Berhema "Mem û Zîn" a nemir a XANÎ ji çirokeke gelêri hatiye wergirtin.

Ew zîmanê gelêri ku wi nivîsibû, ji stîla nivîsa wê demê ra biyani bû û stîleke xas û



zımaneki bılınd bı kar ani bû.

Babeta berhema "Mem û zin" babeteke ebedî, evineke bê emsal e. Ew diroka du evindaran bû, ku wek Romeo û Julia bı awayeki trajedik ji hev tîn veqetandin. Ev şîer qedera Kurdan a trajedik, a belavbûn û inkariya wan ji tine zıman. Meriv dikare bêje ku "mem û zin" mina muzeyeki ye ku li ser jiyana kurdan a dewlemend, dûrditi û nêrina wan li ser jiyane bî hemû moral û dabeşbûna wan ê çinayeti dide xuyan.

Ev şîer bı navê gelê wi hatiye pêşkêşkirin:

"Da xelq-ı nebêjtin ku: "Ekrad
Bê marifet in, bê esl û binyad
Enwayê mulet xwedan kutêb in
Kurmanç-ı tenê di bê hesêb in"
Hem ehlê nezer nebên ku: "Kurmanç
Işqê nekırin ji bo xwe amanc


Gufteyên stranên Kurdi yê rawekar, ku mirata wan ê edebi ye, ji "Lawîj" an hatiye çêkirin. Ritma van stranan ji alî zûbûn û giranbûna muzikê ye. Ev kompozisyona hêsan û amadebûyi şîerê dewlemendtir dike. Hinek bawer dikin ku bı qalitebûna stranan ji şexsiyet û qehremaniya Kurdan tê.

Dî vê şîera kurdi da hesteki azad dertê pêş: Şair qimeteke mezîndide evini, azadi û welatê xwe.

*Komele şaxêk sext û gerdin-keş
Asmani şini girtote baweş*

*Serpoşi lûtkey befri zor sipi
Be daristan reş, naw doli kipi...*

Cogey awekan tıyaya qetis-maw:



Her erron naken pêçî şax tewaw.

*Hawar û hajey kef-çerêni çem
Bo tenyayiy şew laye-layey xem!*

*Tûle-rêy barik, tûnawyûn pişkın
Rêbwar exate endêşey bêbın...*

*Naw rêga teq teq, larê berdi zil
Ke hêsta gerdûn pêş nedawe tî!*

*Ga serew jûre, ga serew xware
Tali w şiriniy dinyay rêbware!... (2)*

Şeir bı van rêzên hanê rûmet dide azadiyê.


*Rûbar ji masivan ra got:
Gelek sedemên xezeba mun heyê
Lê yê heri pêşin
Ku ez ji bo azadiyê me
Ji bo masiyên biçûk
Û li diji tora masivan
Û navê hemû çûkan dikolum di rehên wan da
Vedişerim ji ber çavê stêrkan, ewran, bayê û
rojê.*

*Aso ji guhên xwe lê kerr bike
Çiya û av ji ji bir bıkın*

*Wê her darek hebe ku wan bibine
Ku navên wan li ser rehên xwe binivise. (3)*

Kurd, ku bı ditin û baweriyên xwe yê kevn va grêdayine û tu car vê pevgrêdana xwe ya tarixi qut nekırine, tevi guhartinên islami ji, hemû hestên xwe di stran û muzikê da dane der.

Xelkê cotkar di nav zadê xwe yê zêrin da



distrê, dengê stranên koçeran dî nav çiyayan da alan dîde, şerwa bî hevra dî meydana şer da stranên xwe yê evini distrên û qesidên oli (ilahi) û stranên dengbêjên gundan ji dûr va tê bîhistin; û herweha ev e Kurdistan.

Kurd tim distrên -dî girtigehê da, dî azadiyê da, dî serfirazi û xemgini da, dî şer da, dî dilan û duayan da, ew stranan dibêje û dilanê digre û leylana stranên wi bî bayê lî ser welatên ciran radiweşe, bandoreke melodik lî ser wan dîke. Û dî dilanê da hemû hestên xwe dîde nişandan- bî hevalên xwe ra mîl dî mîl da bî dilaneki sîrî rîhê wi ji laşê wi vedîqete û bî dengê elbane û stranên komê xwe wînda dîke.

Gava ew (kurd) dî mîlê keçikeki bedew da dilanê digre, heyraniya xwe ji kêfxweşi û evîniyê ra nişan dîde. Dema ku dî biharê da sîruşt (tabiat) ji nû va dîxemîle û şiyar dîbe, jin û mêr dilanan dîgrî û stranan dibêjin û ev Mithra ronak û şeytan heyran dîhêle (5), wê hingê ew ji bo baran û bereketê dilan dîgrî, ji bo çandîni û berevkîrîna tûyên şîrin dilanê dîgrî; dî wexta zayîna mihan da û her weha dî wexta ku mih tîn beranan berê xwe dîdî zozanan.

Têbîni:

1- Zimanê kurdi, Kurmanci, dikare wek du saxên mezîn ên bîngêhin û du saxên bîçûktîr bê beşkirin. Kurmanciya Bakûr, ji herdu diyalektên

mezîn ên pêşîn pêk tê, lî bakûr, lî rojhûlata bakûr û başûra kurdîstanê tê axaftin. Diyalektên kurmanciya Bakûr bî navên Botani, Cîzîrî, Hekarî, Bahdînanî, Aşîtayî û Beyazîdî tîn bî navkîrî.

Diyalekta mezîna dî Kurdînciya Navîn, angosorani ye ku lî nîveka kurdîstanê tê axaftin. Soranî diyalekta dayîkê ya Sîlêmanî, Sînayî, Ardalanî, Kerkûkî, Germiyani, Hewlêrî, Mukrî, Şarbajêrî û Pîjdari ye.

Herdu diyalektên bîngêhin ên bîçûktîr wek Kurmanciya Başûr lî rojhûlata Kurdîstanê tê axaftin. Kurmanciya başûr ji bo zaravên Fêyli, Kîrmansahî, Laki, Kelhorî, Xanîqîni û çend zaravên dî dayîk e, bîngêh e, ku bî navekî şîrîk "Lûrî" tîn bî navkîrî.

Diyalekta dawî ya mezîna Goranî-Zazayî ye. Goranî lî mîntîqa Hawraman û Zangana tê axaftin û bî navê "kurdiya Mako" tê naskîrî. Goranî, zîmanê pîroz ê cîvata Kakayîs (All-i heq) ê olperest e. Zazayî lî Bingol, Dersîm, Xarpût, Maden û hînek mîntîqên dî, lî dora Diyarbekîr û Ruhayê tê axaftin. Zazayî ji tek zîmanê cîvata Alavîs ê olperest e.

Dî literatûra nîviske da Kurdîstana Iraqê ji beşên dî zêdetîr pêşda çîye. Berya 1930 Kurdî xwedî statuyêke fermî ye lî Iraqê. Iro diyalektên herî başûr bî nîviskî nayên bî karanîni û ji ber wê yekê mantîqî ye ku ev diyalekta kurdi wek du beşên zaravên sereke bîn beşkirî; diyalekta bakûr û diyalekta başûr (meriv dikare bêje yê navîn). Lî bakûr alfabe ya latîni tîn bî karanîni û lî başûr ji alfabe ya cuda ya Erebi û Farîsî tîn bî karanîni. Wek fonetîk alfabe ya latîni ji alfabe ya Erebi pêşdatîr e. (Dr. Kemal Nebez, "Der Schriftsprache der Kurden, 1975" û A.R.M.Amin Zabîhî "A historical preface of Kurdish language, 1977")

2- Şair : Goran, "Geşt le Hewraman".

3- Şair : Şêrko Bêkes, "Rûbar" û "Kok".

4- Dî merasîmên pîroz ên îslamê da ji bo muzîkê cîh tîne. Muzîk, ku ji bir û baweriyên îslamî avêtî ye, dî merasîmên mesebên kurdi ên sîrî da cîheki cuda digre.

5- Stranên Kurdi yê komî yê dewlemend û bêrîkîrî xwedî rehêke dualîzm û evdîtîya Xwedê (evdîtîya Mîthra?) ye. Berya ku Kurd bîbîn îslam, wîsa tîn xuyan ku stranên Kurdi hebûna xwe yê dewlemend wek mîrat ji dualîzmê û evdîtîya xwedê stendîne ku ji alî eşîrên kurdi ên gîrêdayî Mîthra hatiye hînkîrî û tecrubekîrî. (B.Nîkîtin)



Lı Danimarkayê

Jı bo piştgiriye şeveke çanda Kurdi



Lı paytextê Danimarkayê Kopenhagê, dı roja 13.11.90 da, jı aliye KOMKAR-Danimarkayê şeveke çandi hat amadekirin. Çawa tê zanin hersal KOMKAR-Danimarka dı mehên payizê da şeveke çandi çêdike. Îsal jı bı programeke geleki zengin, şahıyeke mezin pêk ani. Dı bernama şevê da, dıgel hozan Şivan PERWER koma



"GOVENDA KURDA" (jı Gurcistana Sovyetê), stranbêj Ferhat TUNÇ (jı Tırkiyê hatibû), stranbêj û sazband Evdoyê Aso û her wisa koma tiyatroya KOMKAR-Danimarkayê û komên govendê yên KOMKAR-Danimarkayê, cih girtibûn.


Bı axaftına serokê KOMKAR-D'yê ra, ku lı ser rewşa gelê me lı welat û tevgera azadiyê qise dıkir, bı resmên diayê didemên jı jiyana gel û welatê

me dıhatın nişandan. Dı axaftına xwe da serokê komelê, bala civatê kışande ser metodên zordesti û hovitiya dijminên gelê Kurd. Her wisa wi bı bir ani ku kovar û rojnameyên Kurdi yên ku lı Tırkiyê tên qedexekirin û dı binê zordestiyê da nın, hewceyi alikariya maddi û manevi ne. Dı şevê da bona kovara "DENG" pere hat komkirin.

Beşdarbûna koma "GOVENDA KURDA", şabûn û kêfxweşike mezin peyda kır. Endamên komê Keremê Anqosi (serwer), stranbêj û sazbandên komê Refiqê Kamıl, Grigori Cımşir Dasını, Mulazımê İsko, Casımê Cerdo, Cemalê Şero û Newroz Botani (jı Kurdistana Iraqê) bı sempati û dılşahike mezin hatın guhdarikirin. "Govenda Kurda" bı Şivan ra jı derketın pêşiya guhdaran û konsereke muzika Kurdi ya gelek hêja pêşkêş kırin.

Dı şevê da nêziki 2000 kesi beşdar bûn. Vê civinê jı careke dın da xuyan ku gelê me lı dervayi welat jı lı çanda xwe, stran û govendên xwe xwedi derdikeve, piştgiriye dıde tevgera azadiyê. Bı rasti şeveke çandi ya geleki bı rêk û pêk bû. Destê KOMKAR-Danimarkayê xweş be ku bı serfirazi xebateke weha amade kır.

Azad Nûbar



PIŞTIRI BO KOVARA DENG

Weki xwendekar dızanin, DENG kovareke mehi ye lı İstembolê çap.dibe. Ew bı aliyê welatparêzên Kurd der tê û xasima ci dide pırsa Kurdi, diji zılm û zordestiya dewleta Tirk derdikeve û her usa ji, çend rûpelên xwe bı Kurdi derdixe.

Ev yek dibe sedemê zordestiyeke mezın diji DENG. Hukumeta Tirk heya niha dest dani ser hemû hejmarên Dengê, xwedi û berpirsiyarên wê çend caran hatın girtın, eza û cefa ditın. Jo bo wan 250 salı zêtir hepis û her usa ji, 150 milyoni zêtir cezayê neqdi dixwazın. Çapxane ji çapkırına wê ditırsın. Bona vê yekê, hejmara 5'a bı riya fotokopi hat zêdekırın ku ev yek lı Tırkiyê cara pêşin pêk tê.

Helbet, ev zordesti ne tenê lı ser Deng e. Lı Tırkiyê lı ser hemû kovar û rojnamên dêmokrat, xasima lı ser yên marksi zordesti heye. Lê ev zılm û zordesti lı ser kovar û rojnamên Kurdi du-sê qat zêde ye. Jı ber vê zordestiyê çend kovarên Kurdan wek "Özgür Gelecek" û "Medya Güneşi" gelek waxt e nıkarın derkevın. Lê DENG baş berxwe dide ku perdê zılm û zordestiyê bıçırine.

Astengê lı pêş kovarên welatparêz ne tenê girtın e, teda ye û ceza ye; dewleta zordest dixwaze bı aliyê abori ji wan bıxeniqine.

Bona vê yekê, piştıgiri ji bo kovar û rojnamên Kurdi ku lı welat derdikevın kareki gelek ferz e û gıranbuha ye. Lı Ewrûpê ji komiteyek hat avakırın bo kar û xebata piştıgiriye. Vê komitê bo piştıgiriya DENG kampanyayek vekır. Her usa ji çend cıvin çêkırın.

Cıvinên bo piştıgiriya Deng heya niha lı Den Haagê (Holanda), Duisburgê, Berlinê û Nürnbergê (Elmanya) çêbûn.

Kesên welatparêz û demokrat ji van cıvınan ra ele-

qeyek mezın nişan dan. Bı hezaran insan tê da beşdar bûn. Sekriterê Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê **Kemal Burkay**, Prof. **Server Tanilli**, Serokê TOB-DER'ê **Gültekin Gazioglu**, Sekriterê Duweminê Gıştı yê HEP'ê (Partiya Xebatê ya Gel) **İsmail Hakkı Ünal**, xudiyê kowara Özgür Gelecek **Mehmet Bayrak**, serokê duwemin ê Komela Mafên Mırovi **Leman Fırına** û nûnerê dın N. **Bayram**, nûnerê DENG M. **Şervan**, nûnerê Komita bo Mafên Mırovi **Sertaç Bucak**, dı van cıvınan da beşdar bûn, qısekırın û piştıgiri nişan dan.

Her usa ji gelek parti, komel û kesên bı nav û deng, jıbo piştıgiriye mesaj şandı bûn ku dı nav wan da Serokwezirê Westfallena Bakûr **Johannes Rau**, Serokwezirê Saarland **Oskar Lafontain**, Partiya Hêşinan (Elmanya), Partiya Sosyalistê Swisrê, **Xaç Sor** (Elmanya), **Medico International**, gelek şubeyên HEP'ê û ya **Komela Mafên Mırovi** (Tırkiye û Kurdıstan), **Cepha Kurdıstana Iraqê** û **Yekiti Niştımani Kurdıstan** hebûn.

Dı şevan da komikên folklorê ya **KOMKAR**'ê ji gelek hêlên Kurdıstanê listikên kurdi nişandan û hozanên hêja **Şivan**, **Rezazi** û komika wi ya mûsikê, **Said Gebari**, **Baran**, **Emekçi**, **Hasret Gültekin**, **Seydo**, **Koma Aştı** û **Dilan** bı kılam û stranên xwe cıvin şên kırın.

Bı kurtahi, cıvinên bo piştıgiriya DENG bı serfirazi derbaz bûn. Her usa ji, piştıgiri ji bo DENG'ê hin berdeyam e. Jı Ewrûpê heya Awûstralyê karker û ronakbirên Kurd, gelek kar û xebat nişan dıdın, fıdakari dıkın ku wê bıdın jıyandın û dengê gelê Kurd neyê bırin.

JİYANA MIHACIRIYÊ Û TESİRA WÊ LI SER ÇANDA ME

Mûnzûr ÇEM

Bı taybeti dı van 30 salên dawı da jı ber sedemên abori û siyasi jı Kurdistanê berbı derva koçeke mezın tê jiyandın. Dı seri da lı Ewrûpaya Rojava û dû ra Amrikaya Bakûr, Avûsturalya û hınek welatên Rojhılata Navin nêzi milyoneki Kurd dijin. Jı ali çandi va tesira ku jiyana miha-ciriyê lı ser Kurdên dervayi welat dihêle, meriv dikare dı bın du serıkan da bicivine:

a) Jı ber sedemê koçbûnê insanên me jı civata xwe dūr dıkevın, bibê nebê dı bın bandora çanda welatê ku dıçınê da dıminın û lı vê derê dıkevın rewşeke wısa ku roj bı roj jı çanda xwe dūr dıkevın.

b) Ew insanên me yên ku jı zordariya dewletên dagırker dūr dıkevın, jı imkan û olaxên fireh ên civatên demokratik (em Rojhılata Navin dervayi viya dıgrın) kelk dıgrın û lı ser zıman û çanda Kurdi dıkevın xebatê.

Rewşa ku dı benda (a) da tê rawekırın du ali ye: İnsanên me jı aliki va dı nav van civatên ku jı ali abori, civaki û çandi da pêşda çûne hini jıyanên nû, kulturên nû, tore û adetên nû dıbin. Bê guman ev rewşa han, wana bı zaninên nû xurt dıke, bergeha bir û baweriyên wan fireh dıke, jı bo baştır nasına dınê alikari dıke. Hilbet ev aliyê meselê pozitiv e. Lı ali dın, dıgel van aliyên pozitiv lı van welatên ku behsa wan tê kırın dejenerbûn û ferdiyetiya insan, lı hember pırsên civaki biyaniti û asimilebûna wan her wext mumkun e -ku jı bo Kurdên dervayi welat konaxa ku viya

gıhiştıyê qet jı ne bıçûk e. Wê çaxê wezifeyên ku dı vi wari da dıkeve ser milê me xuya ye. Dıvê jı aliki va em cehd bıkın da ku insanên xwe jı aliyên nebaş ên kulturên biyani bıparêzın, jı aliki va jı pêşiya windabûna kultura xwe bıgrın, bıparêzın û pêşva bıbin. Gerek meriv qebûl bıke ku, merivên ku demekı dūr û dirêj lı van welatan mane, zarokên lı van deran hatine dınê û mezın bûne jı van civatan tesir dıgrın. Ev rewşa han tıştêki sıruştı ye û meriv nıkare jê bıreve. Û tu sedemeki tune ku meriv jı viya bıtırse. Tıştê gıring ew e ku dı navbera du kulturıan da lı hev hatınek bête pêkanın.

Lı dervayi welat qonaxa xebatên kulturı çı ye?

Gava meriv lı ser vê babetê dıfıkire, dı cih da pırsa ku tê bira meriv ev e: Gelo dı warê çandi da kar û xebatên Kurdên dervayi welat têr dıke, yan jı dı vi wari da qelsi û kêmani, gavên ku bêne avêtın hene?

Aşkere ye ku iro lı welatên cuda çı bı destê rêxıstınan çı jı bı destê yek bı yek merivan, dı warê zıman û kulturê da xebateke gıring heye. Weşanên Kurdi, civinên derheqa kultur û tarıxa Kurdan, lêgerın û lêkolın, belavbûna muzika Kurdi, xebatên folklori û pırozkrınên Newrozê xebatên sereke ne. Hejmara insanên me yên ku hini xwendın û nıvisandına Kurdi dıbin bı lez zêde dıbe. Dı navbera intresa deh sal berê û iro da ya ku jı Newrozê ra tê nişandan ferqiyeki mezın heye û wd. Bêguman vana hemû, pêşketınên dılaşıyê û bı kêrhati ne.



Hejmara insanên me yên ku hini xwendin û nivisandina Kurdi dibin bi lez zêde dibe. Dî wêneyê da raxistina weşanên Kurdi, di Newroza 1989' an da. (KOMKAR-Swêd)

Tevi ku em van xebatên bi cihhati biçûk nabinin ji, divê bête zanin ku di vi wari da gelek kêmani û qelsi li pêşberî me ne. Bêguman ev kêmani û qelsiyên han, her çiqas bi gîştî dirûvê wan bi hev keve ji, welat bi welat ferqi di navbera wan da heye. Û divê meriv vê rewşa han wek tiştêki siruştî bî-bîne. Lewra her welateki şert û zirûfên xwe yên taybetî hene, aliyên wan ên cuda hene û vana li ser xebatên Kurdan pozîtîv an jî negatîv tesîrê dîkîn. Ez di wê baweriyê da me ku wek nîmûne em dîkarin li ser Swêdê bisekinin û nîmûna Swêdê wê bersîva gelek pîrsan bide.

Lî Swêdê:

Dî rastîyê da Swêd, yek jî wan welatan e ku Kurd zêdetîrin kar û xebatên kulturî li vê derê dîkîn. Hetta eger meriv di çarçeva siyaseta dewletê da li meselê binîhêre, herî mafên pêşketî li vi welatî ketîye destê Kurdan. Lê çî heye ku li Swêdê jî, hêj gelek xebatên ku bînan cihanî hene. Kêmanîyên ku li vi welatî tê pêş çavan û kar û xebatên ku wê bînan kîrin, bî kurtî weha dîkarin bîne rawekîrin:

a) Jî bo Kurdên Swêdê xîsûsiyeteke Swêd ew e ku, li vi welatî dî navbera

insanên me da têrî xwe hevkarî û pêwendî nehatiye peydakîrin. Divê meriv pêwendî û hevkarîyê xurt bike û vê pîrsê çareser bike. Dî nava zeman da xebatên ku meriv dîgîhîne nuqtîyeke bî kêr û pozîtîv, di rojên netewî da, di çarçeva bernameyêke xuyakîrî da hevdîtin û li hev civin, civînen kêf û şayî yên çandî, semîner, konferans, xebatên civakî yên dînin. Dî vi wari da her çiqas rola yek bî yek merivan hebe jî, wezîfên eslî dîkevî ser milê rêxîstînen Kurd.

b) Hemû hûrgelên ku hejmara wan bî qasî Kurdan in, di radyo û televizyonê da bî zîmanên xwe xwedî berna ma ne. Dî nav gelên biyanî da yê ku jî vi heqî bêpar maye bî hejmara xwe ya pîr tenê Kurd in. Li gor dîtîna mîn divê Kurd, jî bo bî destxîstîna vi heqê han, xebat û çalakîyêki jî berê xurtîr û firehtîr bîkî û serê xwe bîşînin. Ev çalakîya han, di vi welatî da berya hemû xebatên dîn tê û xebateke serreke ye.

Jî bo vê yekê divê rêxîstînen gelêrî yên ku li Swêdê dîxebîtin, sazîyên çandî, xebatkarên weşanan bînan cem hev, bernameyêke xebatê çêkî û dest bî kampanyakê bîkî. Ev xebata han,



Ewê bikanbin kultura xwe biparêzin? Bêşik girêdayi mezinan e...

wê bibe gava ewil. Disa divê yek bi yek kesên ku bi çalaki ne merivên rêxistinan in, yên ku bi kêri van xebatan tên berbi vê xebatê bêne kişandin. Her wisa divê meriv ji bir neke ku, riya serfiraziyê girêdayi pişt-giriya derdorên Swêdi yên demokratik, çandi û siyasi yên ku bala xwe didin vê babetê, girêdayi çape-meniya Swêdê ye. Evana dibe ku şexis an ji rêxistin bin. Bi vi awayi di bin rêvebiriya organek pêkhati da, babet dikare bigihê xelkê, bigihê partiya siyasi ya li ser hukim û partiyên hevrik, û her weha ji bo gav avêtinê zordayinek li ser wan çêbibe. Divê meriv ji bir neke ku, xebatên heja yên salan yên KOMKAR û Kurdên din, bi ciheki wek Elmanya Federal ji, ku endamê NATO û destki pêş ê Tirkîyê ye, paşda gav dan avêtin. Radyoya WDR a vi welati, ev du sal e ku programên Kurdi diweşin. Her wisa hinek weşanê radyoyên eyaletan ev çend sal e ku programên Kurdi didomin. Li Berlinê, di van demên dawî da Zarokxaneke zarokên Kurd vebû û di vê eyaletê da, bona destpêkirina perwerdegariya zimanê Kurdi, xebata pêşhaziriyê gihiştîye qonaxa dawin.

Her wisa li gelek eyaletên din ji, biryarên ku li diji siyaseta hukumeta nawendi ne tên stendin. Ev rastiyeke ku, heta piştgiriya xelkê neyê stendin û xebat bi wan neyê hîsandin, hevditînên duseri yên ku bi saziyên fermi ra tên kirin an qet nagihije encameki, yan ji gelek zehmet e.

c) Li Swêdê zarokên Kurd xwedî mafên perwerdegariya zimanê zikmaki ne. Lê bi qasi bi destxistina vi mafê han, bi awayaki bi kêr bi karanin û bi karneanina wi ji giring e. Nexwe dibe ku pêşda dersa zimanê dayikê bibe formaliteyeke vala. Di vi wari da berpîrsiyari di seri da dikeve ser milên dê û bav û mamosteyan. Eger ji vi ali va dê û bav guh nedin zarokên xwe û li ser wan nesekinin, eger mamoste qîmetê nedin dersan û perwerdekîrîna zarokan em nikarin pêşiya wan nex-

weşiyar, ku me li jor bal kişande ser wan, bigrin.

Nuqteyeke din ji, kêmaniya navgin û materyalên dersan in. Lê di vi wari da meriv dikare li xebatê hûr bibe, kêmaniyên weha ji holê rake. Divê meriv ji bir neke ku, di salên pêşda bi ihtimaleke xurt ev mafê han li gelek welatan bi dest keve. Eger ev mafê han li welatên din ji bi dest keve, navgin û materyalên li Swêd amadekiri, tecrûbe û serboriyên vê derê digihên wan deran û xebat û çalakiyên wan hêsantir dike. Ev tişt, di eyni wextê da di navbera xebatên ser ziman ên welatên din da paraleliyeki peyda dike û her weha giringiya vê xebatê nişan dide.

Şik tune ku derheqa vê babetê da wezifa esli disa dikeve ser milên mamosteyan. Lê mixabîni tevi ku gelek mamosteyên Kurdi li Swêdê hene ji, di vi wari da xebateke tîr û tije tune. Cehd û xebatên ku hene ji, di çarçeveyeke xebatên şexsi da diminin. Pêwîst e ku mamosteyên Kurdi rojeki zûtir bînin ba hev, munaqêşa van pirsan bikin û eger pêwîst be xebateke rêxistinî saz bikin. Rêxistina ku wê bête sazkin ji, divê ne wek yên berê be, li ser kaxez nemine, bi bernameyeke berbiçav bikeve cehd û xebateke dijwar û heja. Bi vi awayi mamosteyên Kurdi ên Swêdê dikarin bikevin cehdeke kollektiv. Li gor ihtiyaciya zarokên Kurd programên dersê, navgin û materyalan amade bikin û di vi

wari da gav bavêjin. Ev xebata han di navbera mamosteyên kurd da hevkarî û pêwendiyê xurt dîke, dibe sedemê peydakirina berên (berhemên) kolektîv.

d) Hejmara ciwanên Kurd ên Swêd ne hindik e. Mîxabin ku, jî dervayî hinek xebatên qels ên heyî, kar û barekî rêxistinî ku vê beşa civatê, vê beşa herî çalak bine ser hev, wan li hev germ bike, bî hev va bikeline û bîkşîne. nava xebatê, tune. Û divê meriv qebûl bike ku ev belawelayiya han kêmaniyeke giring e.

Rewşa zarokan jî, jî ya ciwana cudatir nîne. Van zarokên han li Swêd dijîn, li vê derê mezîna dibîna û xwedî imkan û olaxên fireh in. Dî rewşeke weha da jî bo têkoşinê bîdestxistinê van zarokan an jî jî dest revandina wan her dem mumkun e. Amadekirina vê nîşê jî bo rojên pêş, him jî bo xebatên dervayî welat him jî jî bo têkoşina welat gaveke giring e. Perwerdegariya zîman, folklor, muzîk, tiyatroyê û hwd. çalakiyên çandî; civîn, festival, ger û kamp metod û rêyên seredanê ne. Bêguman di wî wari da xebatên cûrbecûr komelan hene. Lê rastiyek heye ku, ev kar û çalakiyên han têr nakin. Jî ber vê yekê pêwîst e ku him ev karên heyî bêne xurtkirin, him jî xebateke hin bî plan û program bête ajotin. Ev jî, berya her tiştî wezîfa rêxistinên Kurdan e. Eger ev karê han bî serkeve li hev civandina zarokan, xurtkirina pêwendiyên navbera wan peyda dibe. Her weha jî zîmanê kurdî, çanda galê me, tarîx û cografyaya wî dîrketin qels dibe, di dereceyê giring da pêşî lê tê birin. Ev tê wê manê ku, wê mezînen duwerojê, pêşda bîkarîbîn bîn cem hev, xwe organize bikin û bîbîn xwedî bîyardayîne û insiyatîfê. Ango ev karê han wê jî wan ra hêsaniyê peyda bike. Li welatên dereke nasandina rewşa çanda galê Kurd, aşkerekirina zordariyên dagîrker û peydakirina piştgirî û hevkarî wezîfa hemû kes û rêxistinên welatparêz e. Bêguman ev jî bî cehdkirinê diçe serî. Mîxabin ku di wî wari da jî, cehd û

xebatên heyî bersiva vê pîrsê nade û meriva têr nake. Wek minak, UNESCO salên navbera 1989-1999 wek "Deh Salê Çanda Dîne" elan kiriyê. Ev du sal e ku derheqa vê babetê da xebatên heja hene. Gelo di vê çarçevê da Kurdan jî bo vê rêxistinê (UNESCO) kijan xebat dane pêşiya xwe? Ku hema bêje li hemû welatan sazîyên vê rêxistinê hene. Him meriv dikare berê xebatên xwe bîde van sazîyan him jî bîde nawenda vê rêxistinê, û her weha bî wana gav bîde avêtin da ku ew li dijî zordariya ser çanda galê Kurd derkevin û jî bo parastina wê çalak bîbîn. Wê çaxê çima bî giringî li ser vê meselê nayê sekinin? Eger rêxistinên me yê çandî û demokratîk, merivên me yê kulturzan, nivîskar, mamoste û sinetkarên me serê xwe li ser van meselan serêxwe bîşînin û wana bîkin rojeva xwe, di navbera xwe da munaqêşe bikin û gavan bavêjin, ev kar û xebatên han wê bîkarîbîn bîbîn sedemê germayî û pêwendiyên nêzîktir, bîbîn sedemê belavbûna sarîtiya navbera galê Kurd. Jî xeynî vana firehbûna van çalakiyên çandî, peydabûna xebateke kolektîv, di nava zeman da, bî him şiklên cuda be jî, dikare xîzmetê jî bo peydabûna nawendeke çandî ya Kurd bike.

Encam:

Di encamê da ez dixwazim vi tiştê han jî bîdim xuyan. Dema ku ez wan ditînen jorin tinim zîman, di hinek babetan da pêşniyaran dikim, ez di wê bir û baweriyê da me ku ev karê han ne hêsan e. Berevajiyê wê, ez di wê têgihîştinê da me ku dijwari gelek in. Lê eger li meydanê hinek kêmanî û dijwari hebîn û çareserkirina wan kêmanî û dijwariyan wek wezîfeyek derên pêşiya me, pêwîstiya gavavêtinê wek wezîfe dertê pêşiya me. Ez hêvîdar im ku, rêxistinên me yê vi welatî yê ku berpîrsiyarî li ser milên wan e, yek bî yek insanên me li ser van babetan kûr û dîr bîfîkirin û jî bo gavavêtinê bîkevin xebatê, cehd bikin. Bo çî wê nebe?

JI ZARGOTINA ME

Lihevandin

(BEND-DÎLOK)

Berevkar: B. ZINAR

Besê zû nan dipêje
Kilama xweş dibêje
Ji bo rêya dirêj e.

Bûk e bûka teze ye
Li ber çit û perde ye
Hê li ser xemla xwe ye.

Car cara xwe qurban bikim
Dizik tji dan dikim
Ser xaniya ban bikim
Jinik pir e, can bikim.

Çavreşê çav bilbilê
Sûretsorê gulgulê
Lawik heband bi dilê.

Çavreşê çavê dika
Deri veke hêdika
Zozanê avhênika
Destê min li ser memika.

Çavreş gula .bostana
Dew dikule li zozana
Rûn dika nav derdana
Şir berdide fincana
Dibe nava diwana.

Denê girarê hûr e
Ser tendûrê fûre-fûr e.
Kulê dixwim, girarê naxwim
Delalê min li rêya dûr e.

Derê malê kirkirti
Lingê Gewrê şemiti
Gava Misto çav pêketi

Dilê Misto şewiti.
Delalê dilê dılan i
Li ser dilê min dani
Bi kê ra diçi tu zani.

Dergûşa min qizin e
Hêlekana wê danin e
Bazinê zenda zêrin e.

Egîr tê xwe li ba dike
Gul tji ber mila dike
Rihê min azad dike
Dilê keçika qela dike.

Ez qurbana gulika
Cizme kişande çoka
Çû nêçira kevoka.

Ez qurbana navê te
Seba xatirê bavê te
Çeleng siyarê xalê te
Ji bo kelba diya te.

Ez qurbano qurbanix
Jinek ani ji Bilanix
Devgolik e lêvçarix.

Ez qurbana vi kuri
Pez berdaye vi keri
Dê dêlik e bav guri.

Ez qurbana navê te
Seba xetirê bavê te
Pêçarixê apê te
Destqirêja meta te
Xanima gund dayika te.

Geliyê me gundê me kûr e
Hirç tê da bore-bor e
Dıran lê bûne şûr e.

Gındol mindol sisê ne
Holholê nav Qersê ne
Guharê guhê metê ne.

Gozê di malê da bûk e
Emrê xwe va biçûk e
Ew jineke milûk e.

Ha barkır barkır barkır
Sinê mala xwe barkır
Berê koçê hevraz kır
Qesta zozanê par kır.

Ha bêye bêye bêye
Serxweş kır bı rımê ye
Kilê çavê jinê ye
Şir-penêrê dayê ye
Para melê Mısrê ye.

Hêlekana mın darin e
Dergûşa tê da kurin e
Ku mezin bû, wê qizê xelqê birevine.

Hevsar destê peyê ye
Bûk ling li zengüyê ye

Kes nızane qısmetê kê ye.

Hûnk mûnk bı rê da
Nava gul û giha da
Paşla qizê xelqê da
Bav hêrs bû, darek lê da.

Hûrik mûrik dimeşe
Laçıka seri bı nexş e
Mêr mir canê mın xweş e.

Keleşkewa Bışêri
Gulrihana nav nêni
Sed sıyar hatın ber deri
Rındê nadım tu mêri.

Kurê mın kureki dine
Mına şekır şirin e
Mına gula bı bin e.

Kurê mın kureki şêr
Keçıka bire pişta gir
Zık li wana kire têr
Bawê wan hatın ser mın bı şer.

Kurê mın kurê dinê
Çûbû deşta Mêrdinê
Jin mir kes neçû şûnê.



NİFİR

Berevkar: **Cembeli**

- 1-Afat bı ser te da were!
- 2-Agırê kulê bı mala bavê ketil!
- 3-Ava reş bı çavê te da were!
- 4-Ba lê ketil!
- 5-Bav û birê te bı te şa nibın!
- 6-Belki zar pêşa te negre!
- 7-Belki zincira te ji ezmana bıqete!
- 8-Ber diwaran bimini!

- 9-Ber miraza rûnenê!
- 10-Ber te da jara maran be!
- 11-Bê bav bimini!
- 12-Brûsk li te xe!
- 13-Canê te zer be!
- 14-Cegera te bişewite!
- 15-Cegera te di devê te ra were!
- 16-Derdê te hebe, dermanê te tu-

- nebe!
- 17-Derdê bê derman li te keve!
- 18-Di pêşa te da zarê kurin miz neke!
- 19-Dû heval û hogîran bîminî!
- 20- Emrê te kin û kurt be!
- 21-Sêwiyê ser bî rişk bî!
- 22-Ez meytê te hildim!
- 23-Ez te di axa sar kim!
- 24-Hema usa hêsirê sar bî ser çavê te da were!
- 25-Hestiyê te li hewa be, goştê te li erdê be!
- 26-Hundirê te xîş xîş be!
- 27-Ilancix di gewriya te keve!
- 28-Jana zirav li te keve!
- 29-Kelem li çavê te keve!
- 30-Kevçiyê te qet şil nebe!
- 31-Kevir û kuçik li te bibare!
- 32-Kezeba te ji devê te da bê!
- 33-Kezeba te derê!
- 34-Kezeba te reş be!
- 35-Koka te biqele!
- 36-Koşka li ber kotibûn be!
- 37-Kul devê xwe di devê te ke!
- 38-Kula dernexwin li te xe!
- 39-Kul gewriyê!
- 40-Kula helebê li mala te keve!
- 41-Kula kor li mala te ketî!
- 42-Kula Şam û Helebê li can û bedenê te kar ke!
- 43-Kul xwarî!
- 44-Kurê bavê mirî!
- 45-Kurm guh û bedena te bixwe!
- 46-Mal mirat be!
- 47-Mal li miratê geriyayî!
- 48-Mala xwelî be, xweliya te ji ber bayê bikeve!
- 49-Malik ne ava be!
- 50-Merifeta te li mala bavê te bîmine!
- 51-Mêjiyê te di çavê te ra were!
- 52-Mêş bî firaqa te nekeve!
- 53-Miraz di çava da bîmine!
- 54-Mirata te ji şirikan ra bîmine!
- 55-Nan bibini dew nebini, dew bibini nan nebini!
- 56-Nanê ceh û dewê tîrş bî dest neketî!
- 57-Nalet li şîrê te be!
- 58-Oxira te ya xêrê nebe
- 59-Oxirê te ne ya xêrê be!
- 60-Pari li devê te be, hêsir li çavê te be!
- 61-Perçê mezin guhê te be!
- 62-Pergala te belav be!
- 63-Piznka pis di çavê te da were!
- 64-Piznka xerab lê derketî!
- 65-Roja te ya xweş çavêş be!
- 66-Roja xweş nebini!
- 67-Roj li te neçe ava!
- 68-Serê te bikeve erda reş!
- 69-Serê te di erda sar kim!
- 70-Sitara te tune be!
- 71-Stuyê te bişkê!
- 72-Stuxwar li ber deriyên bîminî!
- 73-Stuyê te di bin te da bîmine!
- 74-Têrbûna te roja eydê be, wi ji bixwi pê vereş!
- 75-Tofana ezmana lê ketî!
- 76-Tu bibelqitî!
- 77-Tu bî gura ra bizûrî!
- 78-Tu bî goştê canê xwe kevi!
- 79-Tu gilê gilêyi bî!
- 80-Tu xêrê ji canê xwe nebini!
- 82-Tu heqê xwe bîdi derzi û dermana, bîdi ber serê xwe!
- 83-Tu bigeri lê ji derdê xwe ra derman nebini!
- 84-Tu bê kefen herî!
- 85-Tu ji keda xwe nexwi!
- 86-Tu lezetê qet nebini!
- 87-Tu derbe-der bî!
- 88-Tu satilcanî bî!
- 89-Tu ji heval û hogîran bîminî!
- 90-Top lê ketî!
- 91-Urt ocaxa te biqele!
- 92-Urt ocaxa te biçê ber miratê!
- 93-Waqîniya zaran li ber guhê te nekeve!
- 94-Warê te qet hêşin nebe!
- 95-Xaniyê bavê te tep be!
- 96-Xêrê ji te nebini!
- 97-Xwedê tu bendan bî destê te veneke!
- 98-Xwelî li serê te be!
- 99-Xweş bî, tîm li ber desta bî!
- 100-Zuriyeta te biqele!

PEYVÊN DÛHEV/3

Berevkar : **VAZGAL**

O

Oxır û felek

P

Pahn û ber

Parse û pûrse

Per û bask

Per û pereng

Pere û pûl

Pesn û spas

Pez û dewar

Pez û rez

Pê û mıl

Pêjn û deng

Pê û pêçi

Pê û qıdûm

Pêxwas û serqot

Pıçûk û mezin

Pır û pûç

Pır û pûş

Pırs û pırsgrêk

Pırti û pine

Pışt û pena

Pızı û pêsir

pir û pirejin

Piroz û bimbarek

Pivaz û sir

Por û poşman

Por û rû

Pûç û vala

Pûk û berf

Pûl û pere

Pûş û çılo

Q

Qal û bela

Qal û qil

Qam û qanat

Qam û qamet

Qab û kavçi

Qab û qacax

Qar û qor

Qayde û qanûn

Qayış û quruş

Qaz û quling

Qeda û bela

Qedir û hurmet

Qedir û merifet

Qedir û qimet

Qehir û bela

Qels û jar

Qenc û xırab

Qenci û camêri

Qenci û sılameti

Qenci û xırabı

Qırar û bıryar

Qırar û mizan

Qesd û plan

Qetul û xwin

Qewl û qırar

Qeyd û bend

Qeyd û lele

Qeyd û zincir

Qeza û bela

Qeza û qeder

Qire û bire (nakoki)

Qır û cır

Qırêj û gemar

Qırın û qûjin

Qırş û qal

Qıtıtk û xwin

Qır û bela

Qır û giri

Qır û hewar

Qır û qetran

Qız û bûk

Qûl û bend

R

Ra û tedbir

Ra û tevdır

Rabûn û rûnıştın

Rast û çep

Rast û dirust

Rav û şıkar

Reben û jar

Reh û riç

Rehm û kerem

Rehet û sehet

Reheti û sılameti

Reng û bën (bon)

Reng û rewş

Reng û rû

Reng û rûsar

Rengin û zengin

Rep û tep

Reş û gran

Reş û rût

Reş û spi

Reş û şın

Ret û qût

Req û teq

Rewş û pergal

Rexne û gotın

Rez û baxçe

Rez û bistan
 Rez û pez
 Rê û dirb
 Rê û olax
 Rê û rast
 Rê û şûn
 Rêk û pêk
 Rêz û hurmet
 Rêz û tertib
 Rih û can
 Rındık û hındık
 Rındık û xweşik
 Ris û garis
 Ruhber û ne ruhber
 Rû û rûçık
 Rût û tût
 Roj û meh
 Ron û zelal

S

Sal û meh
 Salıx û salıxdan
 Salıx û sılûx
 Sal û zeman
 Sar û serma
 Sar û sır
 Sar û germ
 Sax û selim
 Saz û awaz
 Saz û sazband
 Saz û tembûr
 Sebir û qırar
 Sedeqe û belagêr
 Sedeqe û teberık
 Sefil û stûxwar
 Seg û tule
 Seg û şıvan
 Selam û kelim
 Seng û berd(kevir)
 Ser û ber
 Ser û bı
 Ser û çav
 Ser û dil
 Ser û guh
 Ser û mal
 Ser û mêji(Mêşk)
 Ser û pırç
 Ser û pê

Ser û qûn
 Ser û rêdin
 Ser û rû
 Ser û simêl
 Ser û zıman
 Ser û ziyad
 Serbesti û serxwebûn
 Serbılınd û serfiraz
 Serevan û binevan
 Serma û sexleti
 Sereta û bınata
 Seri û kutasi
 Sersera û serçava
 Sê û du
 Sehr û cadû
 Sêwi û stûxwar
 Seyr û sefa
 Seyr û semere
 Seyr û seyahat
 Sık û sar
 Sılsile û pılpile
 Sing û ber
 Sır û seqem
 Sır û serma
 Sıwal û sedeqe
 Sis û pis
 Siyar û peya
 Sond û peyman
 Sor û gewez
 Sor û spi
 Sur û selah
 Sur û tır
 Sûç û tawan
 Sûd û selam
 Sûk û bazar
 Sûk û hêsan
 Sûtal û tolaz

Ş

Şa û kêfxweş
 Şahıd û şihûd
 Şal û şapık
 Şan û mezinahi
 Şan û mıl
 Şan û şeref
 Şan û şewket
 Şar û temezi
 Şalûr û bılbıl

Şax û dax
 Şax û newal
 Şayi û dawet
 Şayi û şın
 Şehir û bazar
 Şeng û şepal
 Şeq û deq
 Şer û nivşer
 Şer û pevçûn
 Şer û şûr
 Şer û xax
 Şerm û heya
 Şert û şırûd
 Şeş û bêş
 Şev û gur(gurd)
 Şên û ava
 Şên û şirin
 Şêr û egit
 Şêr û piling
 Şêr û rovi
 Şêt û har
 Şêwr û mışêwre
 Şêx û mela
 Şık û Şubhe
 Şıl û kût
 Şıl û mıl
 Şılı û şepe
 Şirik û birabeş
 Şirin û şekır
 Şirin û şerbet
 Şıxul û xebat
 Şin û gıri
 Şin û talan
 Şir û reş
 Şir û tır
 Şox û şeng
 Şûr û mertal
 Şûr û tır

T

Ta û derzi
 Taji û tule
 Tal û şirin
 Tal û tij
 talanker û dız
 Tam û bèn
 Tam û xwêy
 taq û tenê

Tar û mar
Tari û dûman
Tari û ron
Tav û sav
Teba û heywan
Tej û tejber
Telim û terbiye
Telim û tore
Tendûr û agir
Teng û bend
Teng û talûke
Teng û tari
Tep û rep
Teq û leq
Teq û req
Ter û hışk
Ter û teze
Terş û talan
Teşi û bêrivan
Teşk û dav
Tevr û bêr
Text û bext
Text û tac
Teyr û tû
Teyşt û sitil
Têke û lêke
Têkel û pêkel
Têr û tiji
Tif û lanet
Tık û tenê
Tır û fis
Tır û top
Tiral û bêkar
Tiral û nezan
Tırb û goristan
Tırs û lez
Tırs û saw
Tırs û telaş
Tırs û xof
Tırş û tal
Tışt û mışt
Tıtûn û per
Ti û birçi
Tir û kevan
Top û tıving
Toq û bend
Tor û bext
Toxim û tov

Toz û xûbar
Tund û tij

U
Uzir û bahane

V
Vık û vala
Vır û derew
Vıra û wıra

W
Wad û gotın
War û warkoz
Wezir û padişa
Welat û diyar
Welat û memleket
Wext û bêwext
Wext û sehet

X
Xal û nişan
Xal û xarzi
Xal û xet
Xam û xas
Xan û man
Xan û qonax
Xanım û xatûn
Xedar û mezın
Xelat û celat
Xelo û celo
Xem û şin
Xem û xeyal(xıyal)
Xemılı û kemılı
Xerc û xerac
Xerac û bac
Xerib û xeribistan
Xew û xeyal
Xezine û define
Xêr û bereket
Xêr û bêr
Xêr û guneh
Xêr û sılamet
Xêr û şer
Xêr û xêrat
Xêr û xweşi
Xıl û xweli
Xır û cır

Xışr û xeml
Xızım û eqreba
Xızmet û xûlami
Xiret û namûs
Xiret û qûwet
Xulam û xızmetkar
Xurde û xaş
Xurmin û nalin
Xurt û agengdar
Xurt û gur
Xurt û zor
Xweşi û reheti
Xweyi û xûdan
Xwin û goşt
Xwin û kêrn

Y
Yar ş neyar
Yaqût û elmas
Yek û dor

Z
Zad û dehl
ZAD û qût
Zad û zexire
Zalım û zorker
Zana û xurt
Zar û zarav
Zar û zêç
Zar û zman
Zari û hewar
Zaro û tıfal
Zelal û şirin
Zelam û zebelah
Zer û zûtuk
Zeri û esmer
Zevi û av
Zevi û zor
Zêr û gewher
Zêr û zeber
Zêr û ziv
Zır û zıbil
Zırt û fort
Zırt û pırt
Zor û xedar
Zor û bor
Zû û dereng

DAWI

Tirênca Cot

Tirênca cot karê xezalê ez kırime dilê xwe,
 Hiş ji min biri, keser zêde kır, qet neda ber dilê xwe,
 Tir ji kewên fıri, kanê melhem, dibêjim sed car ax,
 Mocrûm halê min da dıgiri, horiyê ez hiştım dıldax.

Min ruh da, bışkovık xerıqi, vebû gula cınetê,
 Axriyê sedef reqısın, min gulav mêt eynetê,
 Rêz bûn sitêrkê ezmana, der bû kaniya qudretê,
 İrem bedreng ma gava qelş bû birca şirin şerbetê,
 Nûr jor da hat, heftreng teyisi, bûm nêçirê muhbetê,
 Alım, talibê dinê ji te dıgrın merifetê.

Hemayila dora cındiya dıke nezerê bê pergal e,
 Bejin alif, kêlık zırav keremê ra gale gal e,
 Qanat şenga bihêştê eşqbaz hiştine ser hev mest,
 Neriye ji derdê xezalê lı bılındciya şax lê şıkest.

Tirênca cot karê xezalê
 ez kırime dilê xwe...

Keremê ANQOSI

Xwendevanên hêja:

Ji zûva Redaksiyona Roja Nû dîxwast ku xebatên termolojiya Kurdî, li ser navên heywanan, hêşnahîyan, cografya, halet û navgînên çandîniyê û hwd. bîweşîne. Dî vi wari da, ji xwendevanan ji daxwazî û hin xebat gihîştine destê me. Lê divê em bêjin, berevkirina peyvan bi awaki rast û tekûz, lêkolîn û zanîneke fireh dîxweze. Lê belê em dikarin bi alîkariya xwendevanan, ango bi xebateke tevayî gaveke piçûk bavêjin. Dî her hejmarekî da emê babeteki tesbit bikin, bona ku xwendevan ji bîkarîbîn peyvên xwe yê berevkîrî, di wextê da ji me ra bîşînin. Wek hûn dibînin, me di vê hejmarê da cih daye listeke navê teyr û tuûdan. Bêşik têda wê kêmasî hebin, û dibe ku şaşî ji hebin. Lê em bawer dikin ku bi eleqe û alîkariya xwendevanan emê bîkarîbîn gaveke piçûk bavêjin. Em hêvîder in ku ev yek feydê bigihîne xebateke berfirehtir di pêşerojê da.

Redaksiyona Roja Nû.



Navê Teyr û Tirûdan



Eylo, halo, qertel

Baz

Şahin

Başoke

Teyr

Teyrê berate

Teyrê sisalk, keçelok

Qijik

Qirak, qrang

Qelepaxke

Qijbelek

Alîk

Kund, bûm, bûmê kor, tot

Papaxan

Şevşevok, perçemek, bîlaçemk

Quling

Legleg

Bet

Qotan, kotan

Kotel, tivilîk

Kew

Nêrekew, rîbat

Mêkew, mari

Kewsûsk

Kevok, kotîr

Ganbele

Reşçêle, Reşêlek

Zîrzûl

Darnîqrok, darkutk

Silêmanê dunukîl

Fatmok

Teyrê simîr, simîrmîr

Teyrê tawîs

Teyrê serûtk

Mirişkê avi, tûtîkê avi

Çixîz

Qubeqaz

Qarqarok

Pepûk

Qarûtk

Sorevêtk

Çûk, çivîk

Têti

Çiqçiqok

Çûkê navlingê ga

Bîlbîl

Şalûr

Zerdole

Qumri

Qitîk

Çivîka mêrga

Çûkê heftreng

Têlvîk

Dûsork (Dûvsork)

Hehecîk, dumeqes

Şivanşitexling

Çûkê hudhud

Çûkê hêjira

Botbotîk

Çûkê torotani

Semanek, çor

Dî hejmareke din da emê cih bîdîn navê heywanên kûvî : yên ku dîzên; yên goştîxur û yên gîhaxur. Bî lista navan ra wêneyên (resîm) wan ji bên şandin emêbêtîr kêfweş bîn.





HEVALTIYA DEVE Û KERÊ

Rojek ji rojan deve û ker gotina xwe dikin yek û ji mala xweyê xwe direvin, diçin li deşteki weke Dešta Mûşê diçêrin û ji xwe ra rihet dibin.

Çend roj di navberê ra derbas dibe, ker niyeta xwe li devê xirab dike. Di dilê xwe da dibêje: "Ezê ecêbek wisa binim serê vê stuxwarê, ku ev deşt û zozan tev ji min ra biminin."

Hê ker li ser vê bir û baweriyê difikire, nişkava dengê zengilê karwan seh dike. Çinge çinga zengilê karwan tê.

Ker dibêje: "Wele ji vê yekê çêtir nîn e. Çawa be ker ji karwan ra ne lazîr e. Ezê bikim zîrîni ku serbazîrgan were û devê ji xwe ra bibê, barê xwe lêke."

Wextê karwan nêzikê wan dibe, ker ji devê ra dibêje:

- Birayê deve, zîrîna min tê, ezê qaseki ji xwe ra bikim zîrîni.

Deve ditirse, dibêje:

Ez ketime bextê te birayê ker, hema çend deqe ji di ber xwe bide, ku karwan derbas bû êdi kêfa te ye çawa diki bike. Eger ew dengê zîrîna te seh bikin, wê werin, me bibin û barê xwe li me kin.

Ker car din dibêje:

- Bira, wele ez nikarim xwe zefî bikim, û ker nişkava dike zîrîni.

Gava serkarwan dengê kerê dibihize kêfa wi gelek xweş dibe. Ferman li ser xulamînan dike, dibê: "Kuro ca rabîn li der û doran binihêrin ka ev çî ker e li serê vê çolê bê xweyi maye."

Xulam zûzûka bazdidin, li der û doran dinihêrin, dibinin ku deve û ker



li wê rastê ji xwe ra diçêrin. Xulam herduyan bi hevra didin pêşiya xwe, diajon tinin tevi karwan dikin û karwanê xwe dajon, diçin.

Hê qedereki rê diçin-naçin, ker car din niyeteke xirab difikire. Xwe li ser rê davêje erdê û dibêje:

- Ez pîr nexweş im, ez qet nikarim bi rê da herim, wele ezê bimirin...

Çi awayi dikin ker ranabe ser xwe, çavê xwe digre û xwe li miriti davêje.

Xweyê karwan dibêje: "Geli xulamînan tu çare nine, em ê kerê deynin ser piştê devê bibin, eger ker li vê çolê bimine wê gur wi bixwin." Kerê didine ser piştê devê û cardin karwanê xwe dajon, diçin.

Piştî ku qedereki bi rê da diçin, aqilê devê tê serê wê, ji xwe bi xwe ra dibêje:

"Hela li min û vi kerê kurê kera binihêre ku çî ani serê min, timi di bin barê xelkê da piştê wi kurmi dibe, iro ji min kîriye binê barê xwe, li min siyar bûye, de vê carê tê bibîni."

Deve li ser milê xwe difetile, deng li kerê dike:

- Birako wisa lotîka min tê, tu xwe li ser piştê min rind bigre ku tu nekevi.

Ker lava dike, dibêje:

- Bira ez di bextê te da me, hema hineki ji lotika xwe bigre heta ku min ji piştê te datimn erdê, ezê li serê vi rêya hışk bikivim bimirim.

Deve dibêje:

Bira çend deqe berê ji zırina te dihat, te ji nikaribû zırina xwe bigirta, niha

ji lotika min tê, ez ji nikarim lotika xwe bigrim.

Deve nişkava dide lotika, ker ji piştê wi dikeve ser erdê hışk, û di cih da dimre.

Lema dibêjin: "Dilê qelp nagihije mexseda xwe."

Bavê ZINAR

LISTIKEK



PEŞKA GURO MİR XIDIRO

Komek zarok ji bo listinê li hev dicivin. Di nav xwe da serokeki hildibjêrin dikin Şivan, yeki ji hildibjêrin dikin Gur. Yên mayin ji dibine Pez.

Gur ji hevalên xwe vediqete û diçe. Şivan zarokên ku bûne pez tine ba hev, hin şiretan li wan dike û li derdorên wana diçe û tê. Di destê wi da şivek heye. Carna şiva xwe li ser pez dihejine, carna ji li wana dixê ku ji hev pîr veneqetin û dîr nekevin. Hin caran ji wek şivanên rasti gazi pez û seyên xwe dike, nahêle ku zarokên hevalên wi ji hev dîr bikevin.

Xêlek paşê (piştî demekê) Gur ji dîr va wek gurên rasti tele tel ji jor va tê. Zarokên ku bûne pez, hanhanka tene ba hev û nêziki hev dibin. Şivan ji wê hingê şiva xwe hazir dike, diqire û gazi seyên xwe dike. Lê di vê listikê da zarok nabine se. Her usa wek adet Şivan gazi dike. Ne tenê gazi seyên

xwe her usa ji carna gazi gundiyan ji dike.

Gur nêziki pez dibê, çend caran li dora wana diçe tê, lê mecal nabine ku pencê xwe bigihine pez. Çare nabine vêca riya aşitiyê diceribine, lavayi li Şivan dike û dibêje:

- Peşka Guro, Mir Xıdıro!
Ka para min? Ka para min?

Şivan şiva destê xwe berbî
Gur dihejine û bersiv

dide:

- Para te tune! Ez tu tiştêk ji nadime te.

Gur du sê carên din ji Şivan pezê para xwe dixwaze, lê Şivan nadê, êrişî Gur dike, Gur hêdi hêdi ji para vedikişê û lêdixe diçe. Di taldeki da diranê xwe tûj dike û ji bo şer vedigere ser Şivan û pez.

Bî diranê xwe yê tûjkiri qîçe qîç dike û êriş dibê ser keriyê pez. Bî rasti şerê Şivan û Gur dest pê dike. Zarok hin xurttir li vi ali wi ali baz didin. Carna hinek zarok xwe şaş dikin, ji hevalên xwe vediqetin û zû dikevin dafika Gur. Gur destê xwe li wana dixê û ew ji listikê derdikevin. Her bî vi qaydeyi destê Gur li kijan zarokê keve ew derdikeve, li kêlekê dîsekine û li listikê mêze dike. Ev listika zarokan heta yek kes ji bimine berdewam dike. Lê carna Şivan an ji Gur pîr diwestin û her weha dev ji listikê berdidin.

Helbet ki biweste û ji listikê vekişe, ew bî ser nakeve.



WEŞANÊN NÛ

Qanatê Kurdo

GRAMERA ZMANÊ KURDÎ

kurmanci-sorani

Weşanên Roja Nû

"Gramera Zmanê Kurdi" - Qanatê Kurdo

Weşanên Roja Nû, Stockholm 1990, 335 rûpel.

Mamoste Qanatê Kurdo zana û welatparêzeki hêja bû. Ji zıman û edebiyata Kurdi ra xızmetên mezın kır. Lı ser rêzıman û edebiyata Kurdi gelek efrandinên wi derketın. Du ferhengên Kurdi çêkır. Ferhenga Rûsi-Kurmanci (35 hezar kelime), Ferhenga Rûsi-Sorani (30 hezar kelime). Ji efrandinên wi "Zımanê Kurdi" dı sala 1981 da dı nav weşanên KOMKAR da derket. "Tarixa Edebyeta Kurdi" wek du cıld, dı salên 1983 û 1985 da dı nav weşanên Roja Nû da derket.

Mamosteyê hêja hin dı xweşıya xwe da ev efrandına xwe jı bo çapê jı me ra şandıbû. Lê mıxabın derketına wê gelek dereng ma. Jı ber ku, him dı dorê da kitêbên dın hebûn, him jı hazırkırina efrandıneke weha jı bo çapê gelek kar û wext dıxwaze. Herçıqas dereng jı ket, bı raya me, çapeke rınd û paqıj bû.

Mamoste Q. Kurdo dı kitêbê da lı ser du diyalektên zımanê Kurdi (Kurmanci û Sorani) hûr hûr dısekıne, wekhevi û cudatıyên wan dıde ber çavan, jı çavkaniyên zımanê nıvisandı têr mısalan dıde, her usa jı, xebata xwe bı parçên xwendınê yên bıjare dıxemlıne. Weki tê zanın, dı vi wari da berê jı gelek berhemên wi hebûn û ew bı zımanê Kurdi û Rûsi derketıne. Mamoste Q. Kurdo dı pêşgotına xwe da lı ser vê yekê xwendevanan bı firehi agahdar dıke.

Em bawer ın ku ev kitêb efrandıneke bıngehın e dı warê rêzımanê Kurdi da. Kurdên ku yek jı diyalektên Kurdi dızanın û dıxwazın ê dın jı hin bıın, dıkarın jı vê kitêbê xweş feyde bıstının. (Jı pêşgotınê)

Romaneke Diroki:

"Gülümse ey Dersim-1", Munzur Çem, Weşanên Özgürlük Yolu, Köln 1990, 356 rûpel.

Dı vê pirtûkê da, serpêhatiyên insanên Dersimê yên navbera salên 1930-1950, ango 20 salan tên şırovekırın. Tıştên ku lı vir tên gotın, hin tıştên xeyali û fantazi ninın, ew tıştên qewımı û rast ın. Çendeki pıştı hatına hukmê faşist 12 İlonê 1980, beşeki wê jı çarsed rûpeli zêdetır, dı operasyoneki da kete destê polês. Jı nû va amadekırına vê beşê jı, ne hêsan bû û zemaneki dirêj stend.

Em dı wê baweriyê da nın ku, "Gülümse ey Dersim" jı bo ronahıkırına dewreke diroka me ya nêzik, xızmeteke gırıng tıne cıh. (Jı pêşgotınê)

Munzur Çem


ROMAN

**GÜLÜMSE
EY
DERSİM**

(Cilt 1)

"Navên Kurdi / Kurdische Namen"- A. Bali

Pirtûk bî pêşgotîna weşanxana KOMKAR, bî sê zîmanan: Kurdi, Tırki û Elmani listeke dirêj (jî A heta Z) ya navên Kurdi dîde xwendevanan. Pirtûk 72 rûpel e.



"Govend"- Ferhad

Pirtûka stranên Kurdi, bî nota hatiye amadekirin. Amadekarê pirtûkê Ferhad, jî bo danasîna stranên kurdi, derheq her stranekî da bî zîmanê Elmani şîrovekirînekî jî dîde. Pirtûk 112 rûpel e, jî aliyê weşanxana KOMKAR va hatiye çapkirin.

wê bî zîmanê Tırki, ku jî aliyê Baran va hatiye wergerandin.

"Jinên Kurdistan", Frau in Kurdistan", Weşanên KOMJIN.

Pirtûk bî sê zîmanan : Kurdi, Tırki û Elmani rewşa jinên Kurdistanê tîne zîman. Têda gelek wêne û ilustrasyonan cih girtiye. 96 rûpel e.

"Dersim Destanı" (Destana Dersimê)- Cemşid Mar

Tırki, 52 rûpel, weşanên Riya Azadi.

"Şeyh Sait Destanı" (Destana Şêx Seid) - Rojvanê Cıwan

Tırki, 72 rûpel, Weşanên Riya Azadi.

"Destana Memê Alan", Ber-evoka Roger Lescot, bî pêşgotîna Nurrettin Zaza.

Ev pirtûka han ku di sala 1978'an da li İstenbolê, di nav Weşanên Özgürlük Yolu (Riya Azadi) da derketibû, isal jî nûva hatiye çapkirin.

Li ser rewşa gelê Kurd pirtûkeke hêja, belgeyeke diroki:

Wek hûn dîzanî di 16 Nisanê 1989 da, li Bremenê bî navê "Konferansa navnetewî ya mafên mirovatiyê li Kurdistanê" konferanseke hat çêkirin. Di diroka gelê Kurd da cara yekemî bû ku konferanseke wisa pêk hat.


Dora 200 insanên politik, alim, ronakbîr, rojnamevan, nivîskar û hwd. beşdar bûn. Nivê wan biyani, nivî jî Kurd bûn. Di konferansê da li ser meseleya Kurd jî aliyê diroki, politik, çandî û hunerî va hat qisekirin. Piştî konferansê jî derheqê ditîn û kar û barên wê, deklerasyonê hat belavkirin. Gotar û raporên beşdaran gişkî di vê pirtûkê da cih girtine.

Dokumentation
zur
Internationalen
Konferenz
Menschenrechte
in Kurdistan

14.-16. April 1989
Hochschule Bremen

"Kulilkên Çiya"-

Eskerê Boyik, Weşanên Riya Azadi.



Helbest (şîer), ev jî di sala 1979'an da li Tırkiyê, jî aliyê Weşanxana Riya Azadi hatibû neşîrkirin. Isal di sa hatiye çapkirin. Bî Kurdi û wergera



Zarokên Kurd, ji zarokxana Kurdî ya li Tenstayê, beşdari cejna pirozkirina peymanê Yekîtiya Milletan (UN) bo mafên zarokan bûn, û bi Kurdî û Swêdî stran. (Ji roj-
nama Svenska Dagbladet- Lena Blomquist) FOTO : YVONNE ASEL